

## ‘Navberdanîna civakî’

Peyvên wek ‘îzolasyon’ an jî ‘karantîna’ di bîranînên me yên mirovî de ne peyvên erênî ne. Heta ji bo me kurdan serpêhatiyên me yên bi van peyvan hîn xerabtir û tarîtir in. Her çiqas ev peyv van rojan ji hêla derûnnas û civaknasan ve bên guncavkirin... *Munewer A. Bazan / R.2*



## Çîrokên ferhengekê

Nivîskar di çîrokên xwe de qet ne bi merhamet e û jixwe ya ku çîrokên wê û vê berhema wê derdixe pêş jî ew xedariya wê ya bi wêrekî ya dijberî qedera jinên ku rûyên wan dişibin ên sûcdaran e. Di çîroka Êvara Firrînê de van sûcdarên sedsalan e... *Sîdar Jîr / R.5*



## Rîwayet û rastî

Ji mehan heyva gulanê bû; berfa zozanan dihelîya, avên çem û rûbaran boş bûbûn. Sibê zû rabû ser xwe, cotek nan û hinek pêxwarin kir nav paçekê û li çelteyê xwe dagirt. Paşê çelteyê xwe da milê xwe, babê xwe da pişta xwe û berê xwe da Kelha Gurdêlê... *Reyhan Îke / R.8*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

6-12 Nîsan 2020
Hejmar: 16
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


# Tevgereke xurt ji bo mafên zimanî lazim e

Vê hefteyê koordînatorê Weqfa Mezopotamyayê Mîkaîl Bilbil pirsên rojnameya me bersivandin. Bilbil balkişand ser parastina zimanê kurdî wiha got: “Divê em zanibin ku eger bi awayekî qanûnî statuyeka kurdî çênebe, rewşa wê ne baş e. Ji bo vê yekê jî tevgereka xurt ji bo bidestxistina mafên zimanî lazim e. Tevger, partî û rêxistinên kurdan divê ji bo vê yekê xwedî polîtîkayên zimanî bin û plansazîya wan ên zimanî hebin.” Bilbil der barê rexneyên ku ji bo Rêbera Rastnivîsînê ya kurmanciyê de wiha axivî : “Em hemû rexneyan li cem xwe qeyd dikin û arşîv dikin. Di demên bihê da em dê ji bo nirxandina wan, dîsa civînan çêbikin. Eger tiştên hewceyî guhertinê hebin ku xwedî palpiştên xurt bin, çi lazim be em dê bikin... *Hevpeyvîn Rizoyê Xerzî / RÛPEL -4*



# Korona teşe dide jiyanê




**Bîlançoya kesên ku bi vîrusa koronayê (Covîd 19) dikevin û jiyana xwe ji dest didan giran dibe. Hejmara kesên ku bi nexweşiyê ketine milyonekê derbastir kir û nêzî 70 hezar kesan jî mirin. Pergalên aborî, tenduristî û civakî li hemberî vîrusa koronayê têk çûn. Mirovayî bû qurbana bê tedbîrî û xemsariya dewletan. Korona teşe dide jiyanê û her tişt li gorî wê tê sererastkirin...** *RÛPEL - 7*





## Nivîseke balkêş

Nivîseke Eznîva Reşîd ku di 8’ê adara 1962’yan de di rojnameya Rêya Teze de hatiye weşandin ji çend aliyan ve balkêş e. Eznîva Reşîd bi salan wek bêjer (spîker) di Radiyoya Rewanê de kar kiriye... *Rohat Alakom / R.8*

## Bedenê ma ma ra çi wazeno?

Semedo ma rojanê vîrusê korona ra derbas benê hawnayîş, wayîr vejîyayîşê bedenî zehf muhîm o. Eke ma wayîr ro bedenê xo vecîyê, ma bedenê xo pak û merdiman ra dûrî bigîrê ma go endêke beşkê ene îletey vîrusî xo ra dûrî bigîrê.

Enî heme çî zî bi aqil benê. Verînanê ma vato “Aqil taca zerdin a, serê sereyê her kesî de nîya.” Ma a taca zerdine bigîrê û bidê serey xo. Bi a tace hem wayîrê bedenê xo vecîyê, hem wayîr ro şarê xo vecîyê... *Cemîl Oguz - R.9*

## Şewbeyeka Nû, Cîhaneka Kevn

Constantine P. Cavafy, di helbesta xwe ya bi navê “Li Benda Barbaran” (1904) de digot, “Em ê çi bikin bêyî Barbaran / Ji alîkî ve ew gel çareseriya me bûn.” Zimanê helbestê yewnanî bû. Yewnaniya hemû biyaniyan bi peyva “barbar” pênase kiribû. Lê ziman li xwe vedigeriya... *Selîm Temo / R.6*



## Li dijî koronayê weşana dîjîtal

Silav ji xwînerên xwebûnê re;
Ev demek e em li dijî zehmetiyan bi zimanê dayika xwe rojname derdixin. Ev ji bo me kêfxweşî û serbilindî ye.

Vîrusa koronayê êdî li seranserê cîhanê berbelav bûye. Di rojên koronayê de jî me got ger hefteyê rojekê be jî em ê hewl bidin xwe bigihînin hezkiriyên zimanê kurdî û agahiyan parve bikin.

Bêguman wek xebatkarên rojnameyê me jî hinek tedbîr wergirtin. Kedkarên rojnameyê ev demek e li malên xwe dimînin û li malê xebatên xwe didomînin. Hefteyê rojekê em 3-4 heval tên ligel hev û rojnameyê amade dikin.

Korona bûye parçeyek ji jiyana me. Her çiqas mijareke kurewî be ewqas ji mijareke jiyanî ye. Her kes xwe tecrid dike, civak ji hev dûr dikeve û her tişt dibe online û dîjîtal. Li cîhanê gelek rojname derbasî xebata dîjîtal bûne.

Nexweşî gihîştiye asteke wisa ku em jî neçar in hinek biryarên nû werbigirin. Ji vê hefteyê pê ve em ê giraniya xwe bidin ser xebata rojnameya dîjîtal ango online. Em ê dîsa her hefte heman rojê rojnameya xwe amade bikin û li ser malperê xwe bigihînin xwînerên xwe. Em dixwazin hemû dildarên zimanê kurdî li ser malpera **www.xwebun.org** me bişopînin.

Her wiha ji bo arşîva rojnameyê û ji bo kesên ku dixwazin halê kaxiz bi dest bixin û yan jî ji xwe re arşîvan çêbikin, em ê hejmareke kêm li matbaayê çap bikin. Em ê rojnameyê mehê carekê yanê 4 hejmaran bi kargoyê ji xwîneran re bişînin. Kesên ku dixwazin rojnameyê mehê carekê bi giştî bi dest bixin divê nav, paşnav, navnîşan û telefona xwe ji maila me; **rojname@xwebun.org** re bişînin.

Em mêjî û laşê xwe ji hemû vîrusan paqij bikin.

**EDÎTOR**

# Jin û xweza xwe ji nû ve diafirînin

Adar Şaman



## Xeml û rewşa xwezayê bi hemû giyanwariya xwe dibişkive. Êdî, dem dema berhemdayînê ye. Xweza xwe ji nû ve diafirîne

Meha adarê, di dîroka têkoşîna azadiya gelê kurd de her rojekî wê di nava rûpelên salnameyê de bi tîpên berxwedanê hatine nivîsîn. Nexasim jî hevrêtiya jinê, bi destpêka meha adarê re dikeve qonaxeke nû. Rûyêkî wê berxwedan, serhildan û bîrîna komkujiya Enfal û Helepçe; rûyê wê yê din jî cejn û şahiya Newrozê ye. Weke roja nû ya demsala biharê jî tê pîrozkirin. Diherike û dibe mizgîniya jiyana azad. Bi tilîliyên 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar a Cîhanê dest pê dike. Bi xemilandina kulîlkên biharê re xweza xwe nû dike û bedew dibe. Destpêka demsalê ye adar.

Xeml û rewşa xwezayê bi hemû giyanwariya xwe dibişkive. Êdî, dem dema berhemdayînê ye. Xweza xwe ji nû ve diafirîne, lewma pêwîstiya doşandina bi darê zorê, ne lazim e! Xweza bi hebûnek nû tê xemilandin. Roja nû di rûyê mirovan de dikene.

Îro jî jin, nikare bi vîn û nasnama xwe tev li siyasetê bibe. Zimanê siyaseta heyî zimanê mêrê serwer e. Helbet ne tenê jin civak jî bi her awayî dibe qurbana vê yekê. Jin, bi vê pergalê bawer nake û dizane ku ev pergal ji bo wê ne bi ewle ye. Êdî, qewlê paradîgmaya modernîtê ya kapîtalîst derbas bûye. Rêwîtiya têkoşîna jinê li hember vê zilmê her hebûû wê her tim jî hebe.

Jin, li hember vê siyaseta zayendkujer, pêl bi pêl herîkin qadên çalakiyên pîrozbahiya 8'ê Adarê. Jinan, wek her salêîsal jî, tu kelem û qedexe nasnekirin û meşiyan. Jinan, di têkoşîn û berxwedana 8'ê Adara 2020'an de, rengê xwe da jiyanê. Bi milyonan jin, li çar hewirdorên dinyayê daketin qadan û dengê xwe bilind kirin. Hêrsa jinan, textê desthilatdaran hejand. Tirs û xofek mezin xist dilê mêrê desthilatdar, nijadperest û zayendperest. Jinan, carek din bi têkoşîn û serhildana xwe nîşan dan ku di sedsala 21'emîn de pêşenga nasnameya jiyana azad e.


Jinê bi ruhê têkoşîna xwe ya nû, sînoran derbas kirin. Dîsa hat fêmkirin, têkoşîna ku jin di nav de cihê xwe negire û pêşengiya wê neke, ew têkoşîn bi ser nakeve û civakê azad nake. Bi vê rastiyê, careke din hat fêmkirin ku heyanî jin azad nebe civak jî azad nabe. Jin, bi vê sekn û hêza xwe ya têkoşînê, wê hem xwe û hem jî cîhanê biguherîne. Ji ber ku jinê ji her demê baştir xwe bi hêz û rêxistin kiriye. Tevger, kesayet, kom, komele, sazîû 'civaka jinê' tev bi hev re bi metodên têkoşîneke nû, di kolanên cîhanê de destên xwe dan hev û bi hev re li hember zîhîniyeta mêtingeha patrîarkal serî rakirin. Qad hemû bûn ên jinêû bi rengê jinê hatin xemilandin. Di qêrîna jinê de hêrsa hesapxwestinê dibariya. Mirov di sekna jinan de hema bêje di hemû qadên berxwedanê de, heviya 'wê jin cîhanê biguherînin' didît. Em dizanin guhertina cîhanê ne karekî hêsan e lê ku jin bixwaze dikare vê erzûnê jî derbas bike. Pêdivî bi aqil û edaleta jinê heye. Ew hêz û zanebûna ku jin, civakê bandor bike, pêş bixe û biguherîne bi xwe re ava kiriye. Jinê, biryara xwe da û got; 'Êdî, bi vê pergala mêtinger, şerxwaz, qirker, derewîn, tecawizkar, bê exlaq û kedxwar jiyan ne gengaz e.' Rewşa cîhanê ya halê hazir encama kiryarên serdestiya mêr e.

Jinên kurd, bi cil û xemla xwe ya neteweyî li hemû bajar - deverên Kurdistanê zend û bendên xwe badan, lê bi taybetî jî li Amedê Qada Stasyonê, li cih û warê Dayika Taybet a li Silopyayêû dîsa li Stenbolê bi meşû mîtîngan erd hejandin. Bajarê Reqqa ku DAIŞ'ê ji xwe re kiribû 'Paytexta Xelîfetê' û jin di bazarên wê de dihatin firotin, di 8'ê Adarê de ew hîcab û ebayên reş ji ser xwe avêtin. Bejn û bala xwe bi kiras û fîstanan xemilandin. Coşû xeyalên jinên Reqqayê, encama serketina jinên têkoşer û ruhêşoreşa gelan e. Lê em ji bo jinên Şîliyêçi bêjin? Li Şîliyê milyonek jin ku girseya herî bi heybetîbû bi dansa Laz Tesîsê re peyama azadiyê da tevahî jinên cîhanê. Ev berxwedana jinên Şîliyê, hejayî silavkirinê ye.

Wekî tê zanîn dîroka têkoşîna jinê, ne îro dest pê dike. Têkoşîna jinê, bi derketina şaristaniya dewletbûnê re dest pê kir. Jin, li hemberî feraseta newekhevî, statûya li ser koletiya jin û civakê hatiye pêşxistin, her tim di nav lêgerîn û têkoşîna jiyana azad de bû. Her lêgerînek nûbûnek e.

Tevgera jina kurd, li ser koka-axa- çanda dayika xwedawend şîn bû. Bi şîrê bedena dayika pîroz mezin bû. Tevahî berxwedan û têkoşînê dîrokî, weke nirxê têkoşîna azadiyê dîtin. Ji bo parastin, peşxistina vî mîrasî; li ser xeta rêgeza bîrdoziya rizgariya jinê têdikoşe. Bûçavkanîûîlhama têkoşîna tevahî jinên cîhanê.

Jinê, di çalakiyên 8'ê Adarê de, hêza têkoşîna gerdûnî ya li hember pergalê nîşan da. Jin, bi têkoşîn û rêxistina xwe sedsala 21'emîn bike serdem û heyama jinê. Ji ber ku jin, di azadiyê de bi israr û di têkoşînê de bi biryar e. Weke her carê jina kurd, bi coşa 8'ê Adarê bû sergovenda Cejna Newrozêû Newroz pîroz kir.



# Jêbir

*Mizgîn Ronak*

Ku mala bayê hebûya ew ê tu bûyayî, ku tu hebûyayî dê mala bayê ji hebûya, bê tebat û tim rêwî tim nêvî. Kî diçe ew qezenc dike, derî li ser rûyê me digire dibêje gurm! Derî li ser rûyê me dixe daxwaza hevdîtinê di çavên me de dihêle. Bi şevên vemirî dimînin em li pêxasiya her tiştê nîvcomayî. Kî diçe, kî diçe, kî diçe; ew qezenc dike. Pûrtên çûkên me tên rûçikandin. Goya yên mirî ew in lê em bêbask dimînin di nav qalikê hebûnê de.

Kî diçe ew mafdar e, kî diçe ew li kar e, yên bi ser cilên di dolaban de digirîn em in, ên toqek hesin li gewriya wan bicihbûyî... Kî diçe ew bi ser dikeve! Şimika xwe diavêje ser xwesteka me ya ku dibêje; dixwazim dîsa te bibînim. Kenê xwe bi çavên me yên şil û dilê me yê birçî dike, kiras û saqoyê ku dê êdî qet li xwe neke, diavêje ser rûyê me. Pêlavên xwe li cih dihêle û diçe, diçe û qezenc dike. Diçe û deriyê her tiştî li rûyê me digire.

Kî diçe, ew mafdar e dilşah e. Goya yên dijîn em in, na kî diçe ew dijî, yên najîn em in, ên tu tişt nakin, nabêjin lê dijîn ew in; kî diçe ew bi ser dikeve. Êdî li ber nekeve, lîstikek e ev her kes û dora xwe. Gul jî diçin. Şopa gulên çûyî li ser canê te. Wekî ku gul tenê ji bo çûyînê bûne. Şopa xwe ya xembar li ser canê te hiştine û çûne. Îja dibêjin, gul nazik in. Kanê nazikiya wan.

Van rojan tişta ku tu herî pir jê hez dikî jêbir e. Pê rûyê xwe paqij dikî xirt û xirt... Rûyê te ji çi diçe? Ji awêneyê. Carna jî dibe xirtexirta jêbira te û tu hin peyamên li ser rûyê xwe jê dibî. Mesela matmayîn. Dema li ser rûyê te matmayînek ecêb hebe, hema tu bi jêbirê dikevî ser û wî pak dikî. Lê dîsa jî tu û jêbir hêj tam nebûne dost loma jî gelek tiştên ku tu dixwazî ji ser rûyê xwe û rûyê jiyanê paqij bikî, hêj li cihê xwe ne. Mesela di vê nîvroya bi baran de te dixwest tu bindestiyê ji tevî têkiliyan paqij bikî jêbirê.

Jêbirê! Ka were, em ê her tiştê nexweş jê bibin. Bêhntengiya li ser rûyan, qeretî û rûtirşî... Hemû nebaş in. Haydê paqij bike jêbirê! Mesela îro xema çûyîna dayê paqij bike, nehêle li dengê Dîcleyê. Vê valahiya bêdawî, jê bibe jêbirê! Vê nezanîna ku dibêje qey mirin tunebûne ji. Vê nezanînê, vê xemgîniyê, vê diltehliyêbibe jêbirê!

Gul, jêbir û ba, bûne kirdeyên vê nivîsê. Belkî bo me ne kirde bin lê pênûsê nivîsî, tu jêbir nikare jê bibe. Belam bawer dikim ku dê ji we re jî xerîb neyên ev hevok. Lew jiyan tiştek yekqatî, yekwateyî nîn e û di deryaya ku di ruhê me de ye tim pêlpêlî ye. Xwezî bi rastî jî jêbirek hebûya û me karibûya kolonyalîzma bi her rengî, jê bibira, her tiştî paqij bikira.

## Biyan

Munewer Azizoglu Bazan



# 'Navberdanîna civakî' ya hişmendiyê

Peyvên wek 'îzolasyon' an jî 'karantîna' di bîranînên me yên mirovî de ne peyvên erênî ne. Heta ji bo me kurdan serpêhatiyên me yên bi van peyvan hîn xerabtir û tarîtir in. Her çiqas ev peyv van rojan ji hêla derûnnas û civaknasan ve li gorî dema koronayê bên guncavkirin û wek pêdivî naveroka wan bên guhertin jî ji bo me gotinên tahl in.

Fêmkirin, bandorbûn û destgirtina rewşan (di rewşa niha ya koronayê de) li gorî şert û mercên mirovan diguherin. Mînaka herî balkêş di mijara destşûştinê de mirov dikare bide. Dema ku li bakurê cîhanê li dijî vîrusa koronayê 'herî kêm 20 kêlî bi sabûnê destşûştin' şîret tên kirin, li başûrê cîhanê, gelek mirov ne sabûn, derfeta wan a bikaranîna ava paqij tune ye. Ev rewşa heyî ji carekê ve rastiyên çewt ên cîhanê derxist pêşberî me. Me dît ku bandora koronayê li ser mirovan ne wekhev e û li gorî kategoriyên çîn, netewe, 'race', zayendê diguhere. Lê hin tişt jî hene ku di vê demê de rastiya xwe ya gerdûnî tenê binxêz dikin.

Me got ev demên koronayî bi giranî bi peyvên neyînî tên şirovekirin. Hîn ev keraset li ser rûyê cîhanê wisa belav nebibû, pispor behsa xetereya bilindbûna tundiya li nav malê kiribû. 'Îzolasyon' û 'karantîna' dê bandorê, destpêkê li ser jinê bikira. Ji ber ku tê dizanin, her tim di demên betlane û cejnan de tundiya li ser jin û zarokan zêde dibe. Li Wuhanê tundiya li ser jinê sê qat zêdetir bibû. Heta hat gotin, piştî rabûna karantînayê li Çînê bi hezaran hevser ji bo veqetandinê serî li mercên fermî dane. Piştî ku vîrus xwe li hemî dinyayê belav kir, tundiya li nav malbatê jî bi heman lezgîniyê belav bû.

Peyvên 'îzolasyon' û 'karantîna' yê ji bo jinan di demên koronayê de bûn amûrên tundiya fizîkî, derûnî, zayendî û aborî. Ne jiyan lê tundî bi her awayê xwe ket nav çar dîwaran. Ji ber ku ev tundî di nav çar dîwaran de dimîne û dikare xwe veşêre ev awayê şerê cîhanê yê li hemberî jinê her tim didome.

'Navberdanîna civakî' yek ji peyvên demê ye. Bi vê gotinê li seranserê cîhanê tê hewldayîn ku mirov zêde nêzî hevudû nebin da ku vîrus xwe belav neke. Lê ligel vê, gotinên 'piştgirî', 'alîkarî' jî ji bo hevgirtina demê tên bikaranîn. Bi vî awayî rayedar dixwazin bi gotinên 'piştgirî' û 'alîkarî'yê vê navberdanînê relative bikin. Lê belê navberdanîna civakî ji zû ve ye bi taybetî ji hêla hişmendî ve di nav civakên moderniteyê de rûniştiye. Mirov ji hev dûr ketine. Asta takekesiyê (îndividualîzm) bi taybetî di kirînên mirovan de xwe da der. Li welatên rojavayî ligel hemî hişyariyan mirov bê serûçav tiştan kirîn û li mala xwe dan ser hev. Vê yekê mirov nikare bi tenê bi psîkolojiya tirsê yan jî bi trawmaya Şerê Cîhanê yê Duyemîn pênase bike. Ev taybetiya kesayeta moderniteyê ye ku dibêje 'bila piştî min tofan be'.

Lê rastiya ku 'navberdanîna civakî' herî zêde li ser jiyana jinê bandora xwe dike, wekî li jor jî hat gotin, di mijara tundiyê de xwe yekser aşkera dike. Tundî ji bêhêzî, acîzî û ji necivakbûyîna zilam derdikeve holê. Li beramberî vê qutkirina jinê ji civakê jî ji tundiyê re rê vedike. Lewre ji 'navberdanîna civakî' di hêla hişmendiyê de kuştina jinê ye. Jin çiqas civakî be, dê tundî ewqas dûrî wê be. Lewma jî gelek pêwîst e ku jin di vê pêvajoyê de taybetî bi hevzayendên xwe re tim di nav danûstandinê de bin. Parvekirinên xwe, piştgirî û alîkariya xwe bi hev re xurt bikin. Pirsgirêk û çareseriyên xwe bi hev re parve bikin û ji bîr nekin: hem 'tiştên taybet' û hem jî 'tundiya li jinê' mijarên polîtîk in. Tiştên ku di nav çar dîwaran de diqewimin, ne mijarên taybet û malbatî ne. Em hemû jin bi encamên bûyerên nav çar dîwaran re rûbirû ne. Lewre jî divê em bi hev re hewl bidin ku ev çar dîwar ji me re nebin dojeh.

# Di sererastkirina înfazê de cihêkarî

Navenda Nûçeyan



Pêşnûmeya sererastkirina înfazê ji aliyê hikûmetê ve pêşkêşî meclisê hat kirin. Lê girtiyên siyasî tev li sererastkirinê nehatin kirin

Li Tirkiyeyê bi giştî 355 girtîgeh hene û 220 hezar kes dikarin li van girtîgehan bên girtin. Lê hejmara girtiyan ji vê qapasîteyê gelek zêdetir e. Li gorî daneyên fermî nêzî 300 hezar girtî li Tirkiyeyê hene û ji van girtiyan hezar û 334 ji wan girtiyên nexweş in. Di van rojên ku vîrûsa koronayê belav dibe û gelek fikar ji girtîgehan tên krin jî bergiriyên pêwîst ji bo girtigehan nayên girtin.

Hikûmet ji bo bergiriyên li girtîgehan cihakariyê dike nav girtiyan û girtiyên siyasî mehkûmê mirinê dike. Berovajiyê vê yekê ji bo berdana girtiyên edlî dest bi sererastkirinê înfazê kir. Sererastkirina înfazê ku ji bo razemeniya hilbijartinê dixwest nêzî hilbijartinê derxe, ji ber vîrûsa koronayê neçar ma ku niha bîne rojevê. Sererastkirina ku demeke dirêj nîqaş li serê hatin kirin, di 31'ê adarê de pêşkêşî meclisê hat kirin.

**Girtiyên siyasî tev li nekirin**

Serokwekîlê Koma AKP'ê Cahît Ozkan, piştî pêşkirina pêşnûmeya sererastkirinê ya meclisê, têkildarî sererastkirinê daxuyanî da û hurgiliyên wê parve kir. Ozkan got ku pêşnûmaya wan ji 70 xalan pêk tê û sûcên zayendî, tiryak, tundiya li ser jinê, kuştina mirovan û terorê tev li sererastkirina înfazê nekirine. Dê bi sereraskirina înfazê re 90 hezar girtiyên edlî ji girtîgehên vekirî û girtî bên berdan. Wê bi sererastkirina înfazê re dema berdana bi şertê kontrola edlî bibe 3 sal.

Di serî de malbatên girtiyan, rêxistinên hiqûqê û mafên mirovan û partiyên siyasî, pêşnûmeyê ji gelek aliyan ve nirxandin û daxwaz kirin ku girtiyên siyasî tev li pêşnûmeya sererastkirinê bên kirin. Heta li ser van nîqaş û daxwazan, hikûmet serdana HDP û CHP'ê jî kir. Lê li gel van hemû niqaş û daxwazan jî hikûmet di ya xwe de israr kir û girtiyên siyasî tev li sererastkirinê nekir.

**Gul jî bertek nîşan da**

Ji ber ku hikûmet daxwazên civakê li ber çav negirt û girtiyên siyasî tev li sererastkirinê nekir, gelek rêxistin, tevger û ronakbiran rexneyên tund kirin. Rêxistin, tevger û ronakbiran diyar kir ku hikûmet qanûn û Destûra Bingehîn bin pê kiriye û di rewşên awarte de berdana girtiyan divê li gorî şertê wekheviyê pêk bê û hemû girtî bê cihêkarî bên berdan.

Serokkomarê berê yê AKP'ê Abdullah Gul jî bertek nîşanî sererastkirina înfazê ku hikûmet pêşkêşî meclisê kir da. Gul diyar kir ku divê kesên ku sûcên nêrînê kirine û rojnamegerên girtî jî di sererastkirinê de cih bigirin û bên berdan.

**Kampanyaya îmzeyan**

Lê gel vê yekê jî têkoşîna gel, rêxistinên sivîl û partiyên siyasî ya ji bo berdana girtiyên siyasî bi dawî nebû. Di 30'ê adarê de bi pêşengiya MED-TUHAD FED'ê, 39 sazî û rêxistinên civakî û partiyên siyasî, ji bo di înfazê de rêgeza wekheviyê pêk bê, bi sernavê 'Em di înfazê de wekheviyê dixwazin, ji bo her kesî edaleta wekhev' kampanya dan destpekirin. Hedefa kampayayê berhevkirina îmzeya milyonek kesî ye.

Ji bo kampanyayê ji aliyê siyasetmedar, hunermend û ronakbiran ve bi dehan daxuyaniyên nivîskî hatin dayîn û li ser medyaya civakî bangên piştgiriya kampanyayê hatin kirin. Bi hezaran kes tev li kampanyayê bûn û piştgiriya xwe ya ji bo girtiyên siyasî aşkera kirin.

**Name şandin**

Di 2'yê nîsanê de siyasetmedarê kurd Ahmet Turk jî di nav desiyasetmedar û ronakbirên mîna Celal Dogan, Kezban Hatemî, Nesrîn Nas, Oya Baydar, Riza Turmen, Tarhan Erdem û Zulfu Lîvanelî nameyak ji Serokkomar Recep Tayyîp Erdogan re şandin û xwestin ku girtiyên siyasî, rojnameger û parastvanên mafên mirovan jî tev li sererastkirina înfazê bên kirin.

Pêşnûmeya sererastkirinê destpêkê li Komîsyona Edaletê ya Meclisê hat nirxandin û hat qebûlkirin.Piştre jî ji bo erêkirinê dê bê Lîjneya Giştî ya Meclisê. Piştî ku ji aliyê Erdogan ve bê îmzekirin, dê girtiyên ku jê sûd werdigirin yek bi yek bên berdan.

# Plastîkên yekcareyî xwezayê qirêjî dikin!

Bêrîvan Kayî

Piştî ku aktîvîstên saziya bi navê OceansAsiyayê, endamên Greenpeaceyê yên li Tirkiyeyê jî derbarê bikaranîna alavên plastîk de berpirsyar hişyar kirin. Greenpeacê têkildarê alavên plastîkî diyar kir ku bi vîrusa koronayê re bikaranîna alavên plastîk ên tekcarî zêdetir bûye û ev yek jî dê rê li ber xetereyên mezintirîn veke.

Bi vîrusa koronayê re her ku diçe alavên mîna çetel, îskan, bîpet, torbe bi kurtasî alavên ku tenê carek tên bikaranîn zêdetir dikevin nava jiyanê û êdî bûne perçeyek ji jiyana mirovan ên ku wekî alavên hîjyenê tên bikaranîn. Ligel vê yekê jî êdî li her kûçeyê li ber torbeyên çopê û di nav şînkayiya parkan de pêkan e ku mirov rastî lepik, berdevk (maske) ên lastîkî yên alavên tenduristiyê bê.

**Tofana ekolojiyê**

Mirovên ku xwe ji vîrûsê diparêzin lepik û maskeyên xwe yên tenê carekê bi kar tînin davêjin hawîrdora xwe. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku tofana ekolojiyê li ber derî ye. Ji bo ku mirov xwe ji vîrûsê biparêzi, îro li her bajar, tax, kolan û malê berdevk û lepîkên lastîkî yên ku bi sedan salan di nava xwezayê de dimînin û nexweşiyan belav dikin, hene. Ev yek jî dê bibe sedem ku xweza her biçe bi destê mirovan were tunekirin.

Li gorî agahiyên ku aktîvîstên saziya bi navê OceansAsiyayê belav kirine; bi vîrusa koronayê ku li Çînê peyda bû re derdora giravên Sokoyê ya Hong Kongê bi amûrên cerahiyê yên ku hatine avêtin, tije bûne û girav hatine gemarkirin. Hem aktîvîstên xwezayê hem jî zanist, derbarê qirêjkirina hawîrdorê de bi salan e hişyarî didin hemû derdorên berpirsyar. Êdî bi vîrusê re alavên plastîkî ji marketan heta ser sifreyên me hatine. Bi karantînayê re êdî ev alav bûne perçeyek ji mirovan.

**Banga Greenpeaceyê**

Aktivîstên Greenpeaceyê (Aştiya Kesk) yên Tirkiyeyê, li ser hesabên xwe yên medyaya civakî têkildarî bikaranîna plastîkên yekcarî ku bi vîrusa koronayê re zêdetir bûne, agahiyan parve kirin û ev rewş rexne kirin.

Greenpeaceyê di parvekirinên xwe de ji bo paqijiya hawîrdorê û xwezayê jî bang li berpirsyaran kir ku pêşiya bikaranîna alavên plastîkî bigirin û ev tişt got: "Bila xetereya ku her diçe plastîk jiyana zindiyan tehdît dikin, bibînin. Bi vîrusa koronayê re hê zêdetir xweza gemarî dibe û bila alavên yekcarî jiyana zindiyan êdî tehdît neke. Daxwaziya me ji berpirsyaran ew e ku alavên plastîkî tev werin qedexekirin."



## Xweşkanî



Felemez Ulug

# Çapemenî û rêya rast

Vîrusa ku ji Çînê derket û di demeke kurt de li hemû cîhanê belav bû, şaristaniya mirovahiyê xistiye bin xeteriyeke mezin. Her welat li gor asta xwe ya tenduristî, rêvebirî, aborî û civakî dixwaze pêşî li vê şewbê bigire. Lê ji bo civak rast bê agahdarkirin û bikaribe xwe li hemberî vê tehlûkeya heyî biparêze erkeke mezin dikeve ser milê sazî û dezgehên çapemeniyê.

Bêguman her welat li gor refleksên rêvebiya xwe di vê pêvajoyê de dijî. Ji ber her biryar û tedbîrên tên girtin ango nayên girtin yekser jiyana mirovan eleqedar dike, pêwîste ku ev biryar ji hêla saziyên berjewendiyên civakê diparêzin ve bên şopandin û di vê mijarê de civak rast bê agahdarkirin. Ev jî erka çapemeniyê ya yekemîn e.

Lê mixabin di roja me ya îroyîn de li ruxmê êş û azarên vîrusa koronayê û bi taybetî jî vîrusa Covid-19 bi gel dide jiyîn rastî ji hêla rêveberiyên welatan ve ji civakê tê veşartin.

Rêveberiyên heyî ji bo di vê pêvajoyê de ji xwe re ranteke siyasî ava bikin, di bin navê parastina civakê de rastiya tehlûkeya ku civak bi wê re rû bi rû ye vedişêrin. Bi agahiyên şaş û çewt ve hewil didin ku vê tehlûkeya heyî wek bûyereke biçûk bidin nîşandan. Yan jî bi hewildanên lewaz û nebes ve di bin navê tedbîr tên girtin de gel bixapînin.

Di pêvajoyên bi vî rengî de erkeke mezin dikeve ser milê çapemeniyê. Mijar çi dibe bila bibe erk û berpirsyariya her ferdeke/î saziyên çapemeniyê ewe ku agahiyên rast ragihînin gel. Lê mixabin di vê qirnê de mîna rêveberiyên berjewendiyên xwe di ser yên civakê de dibînin hin saziyên çapemeniyê jî genîbûne û ji rastiya prensîbên çapemeniyê dûr ketine.

Di her welatî de saziyên çapemeniyê yên di bin ferman û îdeolojiya rejîmên heyî de kar dikin û li gor daxwazên rêveberiya welat rê nîşanî civakê didin hene. Her çiqas tu welat û saziyên çapemeniyê yên genî bûne li vê rastiyê mikur neyên jî ev rastî di vê pêvajoyê de jî hêla gel ve bi awayekî hîn xurttir û baştir hatiye dîtin.

Dema mijar dibe rastî û rastiya azadiya çapemeniyê yek ji welatên herî tehlûke jî Tirkiye ye. Wek di vê pêvajoyê de jî hat dîtin ku dewleta tirk bi zextên li saziyên çapemeniyê dike nahêle ku rastî bigihêje civakê.

Di demên borî de dewleta tirk di bin navê qaşo axa welat di bin xeteriyê de ye nedihişt çapemeniya welat rastiyê ragihîne. Lê li hemberî vîrusa ku jiyana mirovan tehdît dike çi îdeolojî ango berjewendiyên ferdî dihêle ku civak ji rastiyê mahrûm bimîne.

Di Tirkiyeyê de derew û xapandin bûn nexweşiyek. Ev nexweşî jî ji hêla rêveberiya heyî tê belavkirin. Panzehîra vê nexweşiyê jî ewe ku di vê pêvajoya tenduristiya mirovahî ketiye bin tehlukeyeke mezin de, divê bi ragihandina rastiyan civak bê agahdarkirin. Ev mafê civakê yê herî xwezayî ye. Divê ku di vê pêvajoyê de saziyên çapemeniyê jî nebin şirîkên şaşiyên rejima heyî. Di demên wiha de pêwîstiya civakê bi rastiyan heye. Lewma çi dibe bila bibe erka her ferdekî/e çapemeniyê ragihandina rastiyan e. Pêwîst e em jî rastiya xwe dûr nekevin ku em bikaribin civakbûna xwe biparêzin.

## TEVGEREKE XURT JI BO BIDESTXISTINA MAFÊN ZIMANÎ LAZIM E

# Ji karên ziman re komxebat pêwîst e

→ Rizoyê Xerzî

Em hemû rexneyan li cem xwe qeyd dikin û arşîv dikin. Di demên bihê da em dê ji bo nirxandina wan, dîsa civînan çêbikin. Eger tiştên hewceyî guhertinê hebin ku xwedî palpiştên xurt bin, çi lazim be em dê bikin

*Der barê kar û xebatên zimanê kurdî û nîqaşên dawî yên der barê Rêbera Rastnivisînê ya kurmanciyê de me bi koordînatorê Weqfa Mezopotamyayê Mîkaîl Bilbil re ev hevpeyvîn ji xwînerên xwe re amade kir. Fermo em bi hev re li pirs û bersivan binêrin.*



***Em dixwazin bi vê pirsê dest bi hevpeyvînê bikin; ji ber şewba vîrusa koronayê gelek xebat hatine rawestandin û yan jî xebatonline yan jî li malê tên kirin. Gelo Weqfa Mezopotamyayê di demeke wiha de xebatên xwe çawa dike?***

Vîrusa koronaya wekî her kesî tesîr li rêbaza xebatê me jî kir. Niha em hinek xebatên xwe li malê dikin û yên wekî kurs û perwerdeyê jî me sekinandine. Wekî mînak, me dest bi kursa rêzimana kurmancî ya nûjen kiribû lê niha me navber dayê. Van rojan em dinirxînin ku bi awayê online dîsa dest pê bikin.

***Gelo dikarî hinekî behsa armanc û xebatên Weqfa Mezopotamyayê bikî? Heta niha weqif çiqasî gihîştiye armanca xwe?***

Weqfa Mezopotamyayê bi armanca ku zanîngeheka li ser bingeha kurdî ava bike, di 2013an da hatibû damezirandin. Wê demê atmosfera sîyasî jî hinekî guncan bû. Lê piştra, wekî hûn jî dizanin rewşa sîyasetê xerab bû û zemîna ku zanîngeheka bi kurdî li ser ava bibe, nema. Karê avakirina zanîngeheka bi kurdî, eger rewşa polîtîk xerab be pir zehmet e û mimkun nîne. Lewra daxwaza avakirina zanîngeheka bi kurdî, di heman demê da daxwazeka statuya zimanê gelekî ye jî. Lê herçend niha ji bo avakirina zanîngehê şert û merc ne baş bin jî, weqif nasekine û gelek xebatan dike. Niha em li ser standardîzasyona kurmancîyê, folklora kurdî, ferhengên curbicur, materyalên dersan û hwd. dixebitin ku evana hemû jî bo danîna bingeha zanîngehekê jî girîng in.

***Ez dixwazim têkildarî Rêbera Rastnivîsê ku ji aliyê weqfê ve hatiye amadekirin çend pirsan bikim. Gelek rexne li ser hatin kirin ku hinek jê di kovar û rojnameyan da bûn, hinek jî di medyaya civakî da. Tu van rexneyan bi giştî çawa dibînî?***

Belê, nîqaş û rexne li ser Rêbera Rastnivîsînê çêdibin û çi erênî çi neyînî rexne tên kirin û ev tiştekî baş e. Jixwe em jî dixwazin nîqaş çêbibin. Em dê guh li wan bikin, tesbîtên ku xwedî palpiştên xurt in bêtir mihîm in ji bo me. Em dixwazin ji bo vî zimanî xizmeteka baş bikin. Jixwe armanca me ew e ku bi konsensuseka baş, em rêz û rêçikên rastnivîsîna zimanê xwe daynin. Berî ku em çap bikin jî, me ji zêdetirî sed û bîst kes, dezgeh û sazgehan ra şand û me xwest ew bi çavekî rexneyî Rêbera Rastnivîsînê bixwînin û eger hebin pêşnîyazan xwe bikin. Piştra me dîsa civîneka berfireh çêkir û pêşnîyazên ku hatibûn nirxandin û li gor hin tiştên di cih da bûn, me tiştin guhertin. Eger em vegerin ser nîqaşên niha, em dibînin ku bala gelek kesan kişandîye û hin xalên Rêberê bûne sedema rexneyên wan. Bi şertê ku ne heqaret, kêmdîtin û hwd. bin, em kêfxweş dibin ji bo rexneyan. Hinek kes carcaran rexne û heqaretê tev li hev dikin û di zemîneka ne rast da van nîqaşan dikin.

***Gelo di amadekirina Rêbera Rastnivîsînê de we çi zehmetî kişandin? Tiştê herî zehmet li gor te çi ye?***

Amadekirina rêbereka rastnivîsînê karekî cidî û pir zehmet e. Ji ber ku referans û paşxaneyên her nivîskar, sazgeh, weşanxane, televîzyonekê û hwd. ji hev cuda ne, çêkirina konsensusekê li ser rastnivîsînê pir zehmet e. Eger desthilateka sîyasî û sazgehên navendî yên kurdan hebûna, jixwe ev kar di çerçoveya plansazîya zimanî da, ji aliyê otorîteya zimanî ve dihat kirin û ev zehmetî çênedibûn. Lê li ser navê weqfê, me ji gelek sazgeh û tradîsyonên cuda, mirov anîn cem hev û ev xebat derket holê. Hinek kes belkî kêm dibînin lê ji bo me girîng bû ku me hem endamên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û ya Stenbolê û hem jî zanîngehên Başûr û gelekên din, ji çar perçeyên welatî anîn cem hev û ev xebat bi dawî kir.

***Di Rêberê da li ser bikaranîna daçekên "re" û "de"yê, bikaranîna "î"ya berî "y"yê û hwd. biryarên nû dane. Gelek rexne li ser van meseleyan tê kirin. Tu ji bo van meseleyan nabêjî çi?***

Belkî ji sedî nodê kurdan "ra" û "da"yê bi kar dîînin, ma çima em "re" û "de"yê bi kar biînin? Ji devoka berfiratî (Semsûr, Entab, Meletî, Mereş, Elezîz, Efrîn, Kobonê ...) bigirin heta devoka Serhedê (Mûş, Wan, Qers, ...), ji devoka Xoresanê (Qoçan, Deregez, Şîrwan, Meşed ...) bigirin heta devoka Botanê (Şirnex, Sêrt, Zaxo ...) û heta Tor Abdîn û Behdînanê (Hekarî, Dihok, Amedî, Akre, Şêxan ...) daçekên "ra" û "da" dihên bikaranîn.Wekî tradîsyon, herweha di klasîkên kurdî da jî ji sedî nod weha ye, "ra" û "da" ye. Heke em ji alîyê nêzîkkirina zaravayan ve jî li meseleyê binêrin, dîsa "ra" û "da" li pêş in. Di nimûneyên folklorê da jî em vê yekê dibînin. Xulasegelek palpiştên xurt ên "ra" û "da"yê hene.Meseleya "î"ya berî "y"yê jî ji ber çend sedeman lazim e mirov wê neke "i".Lewra di rastnivîsîna zimanekî da, prensîpeka xurt e ku mirov forma ferhengî ya peyvan biparêze û deforme neke. Çawa ku tu di zimanê nivîskî da nabêjî "melê gund" lê tu dibêjî meleyê gundî", ev jî weha ye. Bi hezaran peyvên kurmancî bi "î"yê bi dawî dibin. Rast e ku dema dengê "î"yê berî "y"yê dihê, kalîteya dengê "î"yê dadixe û wê kurt dike. Lê gelek caran em dîsa wekî "î"yeka kurt bi lêv dikin. Dîsa divê mirov zaravayê kirmanckî ji bîr neke, ew berîya "y"yê "î"yê diparêzin. Axirê li ser ev tiştên ku te pirsîne û yên din, me bi rojan nîqaş kirine û gihîştîne van encaman û palpiştên wan ên xurt hene.

***Rewşa zimanê kurdî û bi taybetî jî li bakur hejmara kesên bi kurmancî dinivîsin û dixwînin tê zanîn, tevî vê rewşê gelek kes difikirin ku li şûna ku hûn jî wekî zimannasên xelkî zimanê xwe hesan bikin we zehmetir kiriye, ji bo vê rexneyê tu çi dibêjî?***

Ya rast, me ziman zehmettir û dijwartir nekirîye. Rêberên rastnivîsînê ji bo zimanê nivîskî ne lê ne ji bo zimanê axaftina rojane ne. Ez û tu, dema ku em sohbetê dikin qet ne problem e ku tu wekî xerzîyan ez jî wekî mêrdînîyan em biaxivin. Lê dema ku dibe zimanê nivîskî çênabe her kesek li gor gund, eşîr û bajarê xwe binivîse. Loma jî di zimanên nivîskî da hinek standard lazim dibin. Me jî hewl daye ku standardên zimanê nivîskî daynin. Em dizanin ku ji bo her kesekî devoka wî xweştir û hêsantir e. Lê çênabe ku her kesek li gor devoka xwe binivîse. Cudabûna di navbera zimanê standard û yê devokî da, hinekî mecbûrî ye û normal e. Herweha dema em li cudabûna zimanê standard û yê devokî dinêrin û berawirdîya wê bikin, em dibînin ku kurdî li gor gelek zimananne xwedî ewqas cudahîyan e û zimanê axaftinê û yê standard nêzîkî hev in.

***Wiha xuyaye ku dê ev nîqaş û gengeşiyên der barê Rêbera Rastnivîsê de demeke dirêj berdewam bikin. Gelo hûnê wan rexneyan bi çi awayî li ber çavan bigirin?***

Rexne baş in û çiqasî Rêbera Rastnivîsînê bihê nîqaşkirin ewqas baş e. Em hemû rexneyan li cem xwe qeyd dikin û arşîv dikin. Di demên bihê da em dê ji bo nirxandina wan, dîsa civînan çêbikin. Eger tiştên hewceyî guhertinê hebin ku xwedî palpiştên xurt bin, çi lazim be em dê bikin.

***Di serî de sazî û dezgehên ragihandinê çi ajans dibin, çi rojname, kovar, televîzyon dibin her yek li gorî xwe rastnivîsekê esas digire. Van sazî û dezgehan çiqasî Rêbera Rastnivîsê esas girtin gelo? Piştî weşandina pirtûkê guhertin çêbûn an na?***

Jixwe armanca Rêbera Rastnivîsînê ew bû ku em çareserîyê ji bo van probleman bibînin ku em hemû bi heman awayî binivîsin. Piştî ku pirtûk çap bû hinek kes û weşanxane û zanîngehan dîyar kirin ku dê li gor wê binivîsin, lê ji bo ku bibe tiştekî giştî hîn wext heye. Prosesên standardîzasyonê demên dirêj dixwazin û weha di pênc deh salan da safî nabin. Em dizanin ku îro bi dehan weşanxaneyên kurdan hene û di alîyê rastnivîsînê da her yek bi awayekî ye, ev piştî wextekê dibe serêşî, bala xwe bidin dewlet û miletên din, miheqeq rêberên wan ên rastnivîsînê hene, lê ji bo kurmancîyê heta niha tiştekî weha nehatibû kirin, loma ewqas sergêjî hene. Divê em vê jî ji bîr nekin, şexs nikarin xebatên bi vî awayî bi tena serê xwe amade bikin. Divê komxebat bin û beşdarî û temsîl hebe.

***Te gelek salan mamostetiya zimanê kurdî kiriye, pirtûkên te hatine weşandin û zimannas î, li gorî te mirov çawa û bi çi rê û rêbazan kurdî bêtir biparêze û bi pêş bixe?***

Di vê meseleyê da divê em realîst bin û zanibin ku eger bi awayekî qanûnî statuyeka kurdî çênebe, rewşa wê ne baş e. Ji bo vê yekê jî tevgereka xurt ji bo bidestxistina mafên zimanî lazim e. Tevger, partî û rêxistinên kurdan divê ji bo vê yekê xwedî polîtîkayên zimanî bin û plansazîya wan yên zimanî hebin.

***Di bin banê Weqfa Mezopotamyayê de xebateke we ya din jî ya ferhenga varyantan e, gelo ew xebat di çi astê de ye û kengî dê wekî pirtûk weke weşandin?***

Belê, em ferhenga rastnivîsînê amade dikin ku ev du sal in em li ser dixebitin û eger em weha dewam bikin belkî heta salekê em xelas bikin. Rêbera Rastnivîsînê û ferhengên rastnivîsînê ji bo standardîzasyona zimanekî, xebatên pir girîng in. Ev xebat û Rêbera Rastnivîsînê dê hevûdin temam bikin.

***Gelo çi xebatên we yên nû yên Weqfa Mezopotamyayê hene?***

Niha çend xebatên me didomin, hinek xebatên me berxelas in û ji bo çapê amade dibin. Wekî mînak pirtûkên li ser folklora kurdî, ferhenga termên zimannasîyê, kovara Folkor û Ziman ku akademîk û bi hekem e, kovara me ya "Folklora Me" ku ji sê mehan carekê dertê, va li ber çapê ne.

***Ji xwendevanên Xwebûnê peyama te ya dawîn hebe kerem bike***

Hêvî dikim xwendevanên Xwebûnê li hember her cureyên vîrusan xwe baş biparêzin.

***Ji bo hevpeyvînê em spas dikin.***

## Mîkaîl Bilbil kî ye?



Di 1978'an de li gundê Mêrdînê Cirnikê çêbûye. Li Zanîngeha Çukurovayê beşa felsefeyê qedandiye. Mastera xwe di 2013'an de li Zanîngeha Artukluyê û doktora jî di 2018'an de li Zanîngeha Zaxoyê li ser sentaksa kurmancî kiriye. Niha li Amedê li Weqfa Mezopotamyayê wekî koordînator dixebite.

# Xwedê xêr ke

Şervan Azad

Seet, 18.37...

Ev demeke dirêj e, ez li nûçeyan nanêrim, rojnameyan naxwînim û her wiha ji nîqaşên siyasî jî dûr im.

Tenê bi ziman, wêje û helbestan re eleqeder im.

Li gor plansaziya min, dema seet bibûya şeşê êvarê wextê xwendina min a pirtûkan dihat.

Ez ji şerabê jî hez dikim. Ji berê de xeyaleke min hebû. Dema bibûma xwedîxanî, min ê şeraba sûryaniyan ji malê kêm nekira. Jixwe tenê ew xeyala min bi cih hatibû. Qedeha şeraba min li ser masê bû û di destê min de jî pirtûka Fyodor Dostoyevskî ya bi navê "Qumarbaz" hebû.

Ji nişkê ve pêjna dêrî hat. Ez rabûm, min derî vekir. Ez kî bibînim baş e? Min dî va mamoste Qaso û Mordemê Licî li ber derî ne.

- Hûn bi xêr hatin mamoste, kerem bikin derbasî hundir bibin.

Qaso:

- Na, em narûnin, karê me heye. Hema lez bike, cilên xwe biguherîne û hinekên xweşik li xwe bike! Kek Mordem dê di rê de ji te re mijarê vebêje.

Bi lez û bez ez çûme odeya xwe, min kincên xwe yên herî xweşik li xwe kirin û em derketin; lê min pir mereq dikir bê ka mijar çi ye û …

Mordem:

- Şero, mizgîniya min li te; mamoste ji te re keçikek dîtiye, em niha diçin wê ji te re bixwazin. Ez ji te mizgîniya xwe dixwazim piştî re ha!

- Mamoste Xwedê kî dîsa Mordemo çi vexwariye wisa vêlavêla xeber dide?! Tu dibêjî qey bi şeraba min vexwarî ew serxweş bûye.

Qaso:

- Kek Mordem rast dibêje Şero can, min ji te re keçikek dîtiye û em niha diçin em ê wê ji te re bixwazin.

Heçku di kanûna ewil de aveke sar bi serê min de kirin, wisa ji xwe re qerisîm.

- Mamoste keçika çi, xwestina çi yaw? Ma ev we çawa bêyî min ev biryar girt?! Ma kîlokek sêv e qey em herin û bisitînin? Û jixwe ez ji yekê hez dikim, ji bilî wê jî bi ti kesê re nazewicim.

Qaso:

- Şero de ka bes biştexile lo, te hetka xwe li ser tevna civakî biriye. Hero dil berdidî yekê, ez navê wan bihejmêrim dê bibe şeveq û hê jî xilas nabin. Mêro hê dibêje nizam çi û nizam çi... Ez te ji vê belayê xilas dikim dîno, hê tu xwe nerazî dikî hek!

Mordem:

- Mamoste rast dibêje. Divê tu jî êdî dev ji wan çewtiyên xwe berdî Şero û êdî bizewicî bipergal tev bigerî.

- Tew, keçelo kumê min li serê te... Bavo ka pêşî tu bizewice û piştî re were van şîretan li min bike birê min!

Mordem beşişî û bi kelecan got:

- Jixwe daweta min jî vê meha bê ye. Min go ez ê ji te re surprîzê bikim; hewceyî surprîzê nema, vêca heke îşê te jî çêbibe belkî em bi hev re daweta xwe bikin.

Qaso:

- Weke kek Mordem gotî ji bo we her duyan êdî jiyaneke bipergal lazim e.

- Hûn rast dibêjin lê çima we bêyî min ev kar kiriye, qenebe we ji min re bigota da min xwe amade bikira! Ma ecela we çi bû bavo?



Qaso:

- Meraqan neke Şero; ez keçikê nas dikim, pir xweşik û şîrîn e. Temenê wê jî hê bîst û çar e, jina malan e, ha ev zend û bendên wê ne, dikare di rojekê de deh teşt nan çêke û komek kuflet hilîne û deyne. Ya kin tam li derba te ye. Navê wê jî Narîn e.

- Mamoste hey Xwedê jê razî, ne em diçin keçikê ji min re bixwazin ne ji te re! Ma qey beleheq gotine: "Tama devê herkesî ji hev cuda ye"? Û ya paşî, em di sedsala bîst û yekemîn de dijîn. Heta keç û kur hevdu nas nekin, çawa çêdibe karê zewacê? Xelkê bi vî şeklî keçik dixwastin lê ew ma di sala kevirpenîr de!

Qaso:

- Bes e loo, de bes e wî! Te serê me bir. Jixwe va em hatin ber deriyê mala keçikê. Meyzê, meyzê! Di malê de deng ji te dernekeve ha! Hema bê em çi bibêjin tu jî bêje "Belê!"

Mordem pê li zîlê kir. Derî li me vekirin û em derbasî hundir bûn. Jixwe haya wan ji hatina me hebû û amadekeriya xwe jî kiribûn.

Mamoste jî du gustîlkên zêr standibûn, di berîka wî de bûn. Heçku dizaniya dê Narînê bidene me, em ê li wir bi erêkirinê re gustîlka xwe deynin.

Welhasil pirsa hal û hewalên hev kirin û hebekê ji xwe re civat germ kirin. Ez jî li koncikekê me û deng jî ji min dernakeve. Nikarim ji şerman serê xwe jî bilind bikim û her ku diçe kelecana min zêde dibe. Min dît carekê Qaso weha ji bavê keçikê re got:

- Em ji bo karekî xêrê li vir in. Bi destura Xweda û bi qewlê Pêxemberê wî, em keçika we Narînê ji Şeroyê me re dixwazin!

Bavê Narînê:

- Hûn li ser çavan hatine. Heke Xwedê kiribe em ê jî bidin. Nesîb, qismet... Lê belê em Şeroyê we nas nakin. Kî ye, çi dike û bi çi karî re eleqeder e?

Mordem:

- Şeroyê me helbestvan e, helbestan dinivîse û dixwîne. Hele hele dema helbesta Yehya Omerî ya bi navê "Bi wê Qur'anê" dixwîne mirov dihele, dihele...

Mamoste hêdîka devê xwe bire ber guhê Mordem û gotê;

- Hiş be kekê Mordem yaw, hiş tu çi dibêjî gidî? Tu dê niha karê me xira bikî wî. Ma qey te sitrana "Ay lê Nûrê" di xwestina dergistiya xwe de ji xezûrê xwe re xwend?! Qurbana te, îşê me xira neke, Xwedê îman kamil kirî...

Qaso:

- Belê Şeroyê me di karê sazkirina serayên dartewl û şînî de dixebite. Perene baş qazanç dike bi kedeke helal. Xaniyê wî jî heye. Ji malbata xwe dûr e, bi tena serê xwe dijî, rewşa wî baş e welhasil.

Ez êdî hew dikarim xwe ragirim. Ji kelecanê sor bûme, ji xwêdanê laşê min şil û pil bûye û ji aliyekî ve jî ez Narînê meraq dikim hema zû dixwazim wê bibînim.

Bavê Narînê:

- Ê de baş e. Ma em ê çi bibêjin? Li ser xêrê be. Êdî, Narîn bûka we ye. Ji we re pîroz û bimbarek be.

Mordem:

- Şero rabe destê xezûrê xwe ramûse.

Ez rabûm min destê wî maçî kir û min hewl da ez destê mamoste jî maçî bikim lê nehêla.

Diya Narînê:

- Keça min, de vêca qehwan bîne.

Ji ber ku ez ê Narînê bibînim hebekê şa bûbûm, lê ji kelecanê hindik maye ji xwe ve biçim û dilê min bixume, rengek tê min û yek diçe.

Mordem:

- Rabe lawo destê xesiyê jî maçî bike. De rabe!

Bi dengê hevalê xwe yê "De rabe!" ez rabûm, lê çi rabim! Dinêrim li derdora min çar pênc hevalên min ên kar...

Yek dibêje: "Xêr e Şero, çi bûye?"

Yek dibêje: "Te kabûsek dît qey?"

Yekî din dibêje: "Çi ye qêreqêra te, te em tirsandin?"

Li derdora xwe dinêrim, li xopana Tekirdaxê me.

Narînoka min ma di dilê min de, min nedît.

*01.12.2019- Tekîrdax*



Sîdar Jîr

## Çîrokên ferhengeke jinan e "Kesî bi qasî min ji te hez nekir"

Di "Kesî bi qasî min ji te hez nekir"ê de serpêhatiyên cografyayeke bi sedan salan e ji rêzê maye yan jî hatiye hiştin bi wêrekî vedibêje. Di çîrokên ku di pirtûkê de cih digirin de, peyvên ku hatine bikaranîn an jî hevokên ku hatine sazkirin ferhengeke xurt a jinane ya Kurdistanê li ber me radixe… "Pora min çiqas reş e, vê reşiyê masûmiyet û pakî bi min ve nehiştiye, rûyê min dişibe rûyê keçeke sûcdar." Di çîroka Dostaniya ligel sêvê vê ferhenga jinane gelekî bi hosteyî nîşanî xwîner dide. Di gelek çîrokan de gelek hevokên ku tenê di ferhenga jinane de dikare bibe xwedî gewde balê dikêşin. Seher Resayî di çîrokên vê berhemê de, jiyana zor û zehmet a jinan ku mesele ne tenê ew û serpêhatiyên wê yan jî yên keçekê ne. Di her çîrokê de bêhtir diyar dibe ku çîrokên hemû jinan xistiye qefesa sînga xwe yan jî ya jineke tekane û bi sewt û olana xwe, li ser navê hemû jinên ku "rûyê wan dişibe rûyê sûcdaran" û bi hevokên ku bi sedsalan hatine parzûnkirin derpêşî civaka baviksalarî dike…


Nivîskar di çîrokên xwe de qet ne bi merhamet e û jixwe ya ku çîrokên wê û vê berhema wê derdixe pêş jî ew xedarîya wê ya bi wêrekî ya dijberî qedera jinên ku rûyên wan dişibin ên sûcdaran e. Di çîroka Êvara Firrînê de van sûcdarên sedsalane(!) wisa vedibêje; "Ez zarok bûm, gava bi min re diaxivî, gava behsa maçên xwe yên heram dikir winda dibû, em winda dibûn. Min nedizanî xiyanet, maça heram, îtiraf û birûtîqijilîn, bidestxwenebûn ma'neya wan çi ye."

Ya rast nivîskar bi rûyekî wêrek û paqij dajo ser "sûcdarîya xwe" ku civakê li ser ferz kiriye. Di çîroka "Roja diziya desmalkan û maçên heram ên bavê min" de, çîroknûs wêrekiyê û hunera çîroknûsîyê derdixe lûtkeyê û şikestina jinan a ku ji nivşekî xwe gihandiye nivşekî din, bêyî metirsî lê bi keser û bi giranîya ser dilê xwe rewşa civakî ya jinên welatê xwe vedibêje. Mînakên min 'heta niha destnîşan kirine, xetereyekê ji di nava xwe de di'hewînin û kesê/a bixwîne kare bêje qey jin weke metayekê di qebûla nivîskar de cih girtiye. Lê na, helwesta lehenga vê çîrokê serhildaneke qewîn a bêdeng bi xwe ye; Lehenga ku bavê wê û dostika wê li odeya razana dêya wê bi hev şa dibin, sal û dem dikeve navê bi heman awayî mêrê wê û dostika xwe bi hev şa dibin, lê lehenga çîrokê nikare wekî dêya xwe tehamul bike û vê rewşê qebûl bike, tenê radihêle pêlavên xwe û bi temamî DIÇE.

Seher Resayî di çîrokên vê pirtûkê de tenê li ruhê jinê asê namîne û bi wêrekî pênûsa xwe li ser hemû bedena jinê digerîne û bi wê jî namîne gelekî bi wêrekî rewşa ne li rê ya yekbûna laşê jin û mêran davêje rasta hewşê ya ku lehengê wê destmalk lê didizî…

Di hevoka dawîn a çîroka dawîn a pirtûkê –Newhirandinê Tenayîyêku dibêje; "Bila bê bîra te ez siya te me, sî"em li xwe û rastîya xwe hay dibin ku di hemû çîrokan de leheng em bi xwe ne û çîroknûsê tenê vebeyîna me yan jî siya me vegotiye.

# Pakêta li dijî koronayê û rewşa aboriya welatiyan



Ramazan Tunç
ramazan.tunc@live.com

Wek pêşîlêgirtina belavbûna koronayê, ji bo tesîra koronayê ya li ser tenduristiya mirovan, aborî, fînans û pişta gel bişkênin, gelek hikûmet û dewletan budçeyên bilind veqetandin. Di vê tevlihevî, alozî û xiringêlê de (kaos) ku ji ber Covid-19'ê derket, peywira herî mezîn û yekem a hikûmet û dewletan ew e ku welatiyên xwe biparêzin û pêşiyê li têkçûna tenduristî û aboriya xelkê xwe bigirin. Li gor raportên Fona Navnetewî ya Pere (IMF) ji bo aborî û fînasa gelê xwe biparêzin, gelek dewletan pakêtên berfereh ên darayî (fiskal), pereyî û makrofinansî, pereguhertin û hevsengiya peredayînê xistin meriyetê. Van pakêtan bi piranî bingeha xwe ji nêrînên Keynes, Milton Friedman û modela Mundell-Fleming digirin. Di van pakêtan de tişta herî balkêş ew e, ku hemû welat bi pakêtên berfîreh ji bo destê welatiyan xurt bikin, rewşa pereyî, darayî û hevsenga piyaseyê xurt bikin, hewl didin. Li gor raportên ku IMF roj bi roj diweşîne em dikarin li ser tabloya li jêrê hinek nirxandinan bikin.

Di tabloyê de jî xuya dibe, ku dewletên hêza wan zêde ye, ji bo ku welatiyên xwe biparêzin, deriyê gencîneyê vekirine û rasterast pere radizînin hesabên welatiyên xwe yên ku ji ber bandora koronayê zirarê dibînin. Hikûmeta Amerîkayê bi 2.2 bilyon dolarî piştgiriyê dide welatiyan, kargehên biçûk, kargehên navîn û mezin. Serê kesekî 1200 dolarê Amerîkî rasterast radizîne hesabê kesan ên bankayê. Li Keyaniya Yekbûyî jî dîsa pakêtên bi kitekit ji bo kesan û kargehan hatine amadekirin. Li Fransayê jî 45 bilyon ewro hatiye veqetandin. Li Almanyayê 156 bilyon ewro. Li welatên Ewropayê ne tenê dewletan pakêtên bi bandor ên darayî diyar kirin, Yekîtiya Ewropayê (YE) 37 bilyon ewro û Bankaya Navendî ya Ewropayê (ECB-BNE) jî pakêta pêşîlegirtinê ya ji 120 bilyon ewroyan pêk tê, diyar kir. Welatên ku endamên YE û BNE'yê ne jî ew ê ji van pakêtan para xwe bigirin. Armanca hemû pakêtan ew e, ku piyaseyê ji tengaviya lîkîdîteyê derxin û vê şokê bi xesarên hindik derbas bikin. Di nav şokên fînansê yên wiha de ji bo piyase nesekine, tedbîr tên wergirtin. Ev tedbîr jî ji bo sê qadan pêwîst in. Qadên darayî, pereyî û makrofînansê; rêjeya pereguherînê û hevsenga peredayînê. Mînak Fransayê ji derveyî rêzaniyên darayî zedetirî 300 bilyon ewro jî amûrên pereyî û makrofînansê derdixe û di piyaseyê de lîkîdîteyê zêde dike. Belçîka jî zêdetirî 50 bilyon ewro bi amûrên lîkîdîteyê li hemberî Covid-19'ê destwerdana pêk anî. DYA'yê pêşî li lîkîdîteyê negirt û ji derveyî veqetandina 2.2 trilyon dolarî, destnîşan kir ku ji bo lîkîdîteyê zêde bike tu sînoran danayîne.

Li Tirkiyeyê jî pakêteke bi qasî 10 bilyon dolarî hat diyarkirin lê pêwîstiya Tirkiyeyê bi pakêteke ji vê zêdetir heye. Ji ber ku rewşa nîşaneyên (îndîkator) aboriya Tirkiyeyê ne xweş e, gelek zehmet e ku vê şokê bi pakêteke 10 bilyon (100 milyar TL) dolarî derbas bike. Ev îndîkator bi kurtasî wek tabloya jêrîn e.

*1-* Pere di budçeya dewletê de nemaye, pêwîstî bi foneke mezin heye û ew fon jî encax tenê bi deyn dikare bê dîtin.

*2-* Stratejiya bi bankayên taybet û gelemperî (giştî) him xwedîkirina dewletê him jî xwedîkirina sektorên taybet, hevsengiyê xera dike.

*3-* Deynên Tirkiyeyê yên derveyî zêdêyî û 437 bilyon dolarê Amerîkî ne û ji vî deynî 172 bilyon dolar serdemkin e û di demeke kin de tê xwestin.

*4*-Rezervên-çavkaniyên Bankaya Navend a Cumhûriyetê (TCMB) heliyane û hatine asta tunebûnê. Li gor raportên IMF'yê ev rezerv li derdora 10 bilyon dolarê bi qasî pakêta ku hikûmetê diyarkiriye ye.

*5-* Amûrên ku hikûmet pê polîtîkayan bisepîne pir kêm in û ne bibandor in.

*6-* Betalî û bêkarî roj bi roj zêde dibe. A niha 4 milyon û 200 hezar kes bêkar û betal in. Rêjeya betaliyê %14 ye û di nav ciwanan de ji 3 kesan kesek betal e. Di nav ciwanan de betalî ji vê rêjeyê zêdetir e. Ji 3 ciwanan 1 bêkar e.

Di nav vê rewşê de tenê amûrek dimîne ji bo ku Bankaya Navendî mudaxle bike û ew jî çapkirina pere ye. Ew amûr jî bi piranî nirxê pere û rêjeya pereguherînê dadixe.

Ji bo amadebûna van şokan ez dixwazim balê bikişînim ser du têgehan. Yek "Başbûna fînansî-Financial Well-being" a din jî "Jêhatîbûna Fînansî-Financial Capability" e. Derdorên perwerdekarên fînansê gelek bi girîngî li ser van her du têgihan disekinin. Li gor aborînasê Bankaya Cîhanê (World-bank) Elaine Kempson "Jêhatîbûna Fînansî-Financial Capability" a hinek welatan gelekî lawaz e. Li welatên dewlemend û welatên ku hemwelatiyên wan di warê jêhatîbûna fînansî de xurt in, hikûmet bi bilyon doloran piştgiriyê didin welatiyên xwe. Di vê şoka ku dê tesîrên wê serdemeke dirêj dom bikin de stratejî û polîtîkayên dewletan li gor amûrên di destên wan de diyar dibin. Dewletên ku amûrên wan ên fînansî pircure ne, li wê gorê gavan diavêjin û nahêlin ku hêviya welatiyên wan ji wan bişikê. Welatên dewlemend ji bo başbûna finsaî û jêhatîbûna fînansî ya welatiyên xwe polîtîkayên xwe bi hemû amûrên di destên xwe de bi rê ve dibin. Bi van amadekariyan welatiyên xwe li hemberî şokan diparêzin. Welatên ku amûrên wan kêm in jî, bi tenê ji bo ku têgihêja civakê bileyîzin bi propagandayê dixwazin vê pêvajoya qeyranê derbas bikin. Lê çi dibe bi xelk û hemwelatiyan dibe. Ev alozî du mehan dewam bike ew ê gelek kes ji kar bên avêtin û başbûn û jêhatîbûna wan a fînansî ji dest here. Li Tirkiyeyê jî hikûmet ji welatiyan pere dixwaze. Çewtiyek di belavkirina budçêyê û dahatê de heye. Ew çewtî wek ku Apê Mûsa aniye ziman Qimil e. Ev qimil îsal Covid-19 e. Ev hejdeh sal in qimil kî bûn? Di dawiya dawîn de şoka Covid-19'ê li Tirkiyeyê du encam derxistin pêş. Rez ji xwe ne ti rez bû, teyrokê jî lê da û ji guran şivanê berxikan dernakeve.

| Welêt/Komar | Veqetandina Budçeyê - Darayî (Bilyon-Milyar) USD | RêjeyaDNG (%) |
|---|---|---|
| Avustralia | $189.00 | 9.7% |
| Austria | 38.00 € | 9.0% |
| Belçîka | 10.00 € | 2.0% |
| Çîn | $1,300.00 | 1.2% |
| Êcipt(Mısır) | $6.40 | 2.0% |
| Estonia | 2.00 € | 7.0% |
| YekîtiyaEwropayê | 37.00 € (EU27 DNG-GDP) | 0.3% |
| Fransa | 45.00 € | 2.0% |
| Almanya | 156.00 € | 4.5% |
| Yewnanistan | 10.00 € | 5.0% |
| Îsraîl | $15.00 | 1.1% |
| Îtalya | 25.00 € | 1.4% |
| Japonya | 446 Yuan(¥) | 0.1% |
| Malta | $1.80 | 12.0% |
| Norwec | 66.6 NOK | 2.2% |
| Portegis | $3.00 | 1.4% |
| Qatar | $20.60 | 13.0% |
| Turkiye | $11.60 | 1.5% |
| Keyaniya Yekbûyî (Britanya-UK) | £330.00 | 15.0% |
| Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê(DYA) | 2.200 | 10.0% |

**Çavkanî:** *IMF, Şopandina Polîtîkayên (Rêzaniyên) Li Dijî Covid19, (https://www.imf.org/en/Topics/imf-and-covid19/Policy-Responses-to-COVID-19)*

## Ferhenga aborî û fînansê

Guhertingeha (Piyaseya) Pereguhertinê (Exchange Market-Döviz Borsası (Piyasası)): Piyaseya ku dan û standina pere ango pevguherîna pereyan tê de tê kirin. Ji cihê ku dan û standina pere lê tê kirin an jî pevguherîna pere lê pêk tê re guhertingeh an jî buroya dowîzê tê gotin.

Rêjeya pereguhertinê (Exchange Rate-Döviz Kuru): Binavkirina nirxê pereyê welatekî li hemberî pereyê welatekî din. Ji rêjeya nirx re jî parîte tê gotin. Nirxê pereyê her welatî cuda ye. Ev nirx li gor bihêzbûna darayî, aborî û fînansî ya welatan diyar dibe. Aborî çiqas xurt be rêjeya li hemberî pereyên din zêde ye. Xurtbûna aboriyê jî girêdayî hêza standinê ye ku li gorya Parîteya Hêza Standinê(HSP)-Purchasing Power Parity(PPP) tê pîvan.

Polîtîkayên Darayî - Fiskal (Fiscal Policy- Maliye Politikası): Rêzaniyên têkildarî dahat û lêçûnên dewletan. Rêzaniya bacê û zihakirina budçeyê ya li gor daxwaza piyaseyê. Ji bo bêkarî û hevsenga mal û xizmetan dewlet rêzaniyên darayî disepînin. Ev polîtîka bi piranî li gor nêrînên aborînasê îngilîz John Maynard Keynes tên destnîşankirin.

## Gotinek ji gotinên pêşiyên me

Ji gura şivanê berxikan dernakeve: Ji bo kesên ku mirov nikare baweriya xwe bi wan bîne, tiştên xwe bispêre wan, nikare berpirsiyariya tiştên girîng bide wan, tê bikaranîn. Kesên ku bi tu awayî mirov nikare baweriya xwe bi wan bîne.



Mertal

Selîm Temo

## Şewbeyeka Nû, Cîhaneka Kevn

Constantine P. Cavafy, di helbesta xwe ya bi navê "Li Benda Barbaran" (1904) de digot, "Em ê çi bikin bêyî Barbaran / Ji alîkî ve ew gel çareseriya me bûn." Zimanê helbestê Yewnanî bû. Yewnaniya hemû biyaniyan bi peyva "barbar" pênase kiribû. Lê ziman li xwe vedigeriya û xwe jî rexne dikir di helbestê da.

Di romana "Çola Teteran" a Dino Buzzati da jî li benda Barbaran in. Kelehek li sînorê Başur li hemberî Barbaran hatiye lêkirin, lê Barbar nayên.

Buzzati jî wek Cavafy ji çanda Deryaya Spî tê ku bi sedan salan xwe wek navenda şaristaniyê dihesiband. Fernand Braudelê bi emrê xwe ji herduyan biçûktir digot diyardeyên çanda mirovatiyê li dora vê deryayê hil bûne.

Vê gola xwemalî, okyanûsa şermoke xwe li navbera sê bejahiyan pîj kiribû. Hemû împaratorî yan li dorê avabûn, yan xwestin xwe bigihînin peravên wê. Barbar jî.

Barbar hatin û heya sînorê Deryaya Spî û devê Atlantîkê çûn, ew neqeba Ereban jê re "babu'l-mendeb" (deriyên mirinê) digotin.

Barbar çi kes bûn? Gelo Hûn, Mogol û Tirkên ji Nîveka Asyayê bûn? Yan Erebên keştiyên xwe şewitandin û xwe mecbûrê serfiraziyê kirin? Yan Med û Persên xwe li nav sîteyên Yewnaniyan xistin? Ne Kelt û paganên cîranên Cemsera Bakur bin?

Gava Barbar hatin û xwîna germ a ji serikê rimên xwe yên dozdemovik dilopiya di çemên qurrê yên Ewropa de şuştin, gotin "vae victis" (weyl li têkçûyan)!

Ewropayê wek bejahî û şaristanî xwe bi tirs û xetereya hatina Barbaran honand. Lê piştî ew hatin û xwe pîj kirin, Ewropiyan deriyên dêran girtin, simya çû û kimya hat, dûkel bi ser keştiyan ket. Dû re dest bi "paqijkirina hundir" kirin.

Erebên Endilûsê girtibûn derxistin, dû re Cihûyên Seferadî û Osmaniyên doşirme. Ev bejiya xwe li ser kapitalîzm, exlaqê Protestaniyê û tirsa hebûna Barbaran ava kiribû, çû di mala wan de bi ser barbaran ve girt. Bi sedsalan heyî û dewlemendî kişandin şikefta xwe. Piştî demekê dît ku barbar nemane. Îca dê çi kiriba? Êdî ne wextê Barbaran bû, diviyabû tirsek dî bihata dîtin.

**Barbarên nû, di şiklê şewbeyêkê de hatin.**

Di dema barbaran de jî hatibûn.Veba û kolera bi eslê xwe ji derve bûn. Êdî deriyên Ewropayê li Balkanan, li ser çemê Tunayê, yanê li Rojhilatê Ewropayê bûn. Babu'l-mendebên nû.

Îro ji ber derê van deriyan wek Ewropaya esasî nayê dîtin. Demek dirêj, di serdema Şerê Sar de wek "Deriyê Hesinî" hat bi nav kirin. Di lansmana lehengên gelêrî/xiyalî de jî diyar e; yên li pişt Deriyê Hesinî û Balkanan simbolên xof û rêbiriyê ne, yên Ewropaya Rojava simbolên evîn û romantîzmê!

Covid-19 jî ji derve hat. Dişibe veba û koleraye. Ewropiyên min û te, pêşî gotin bi destê barbaran hatiye çêkirin. Dû re xistin stûyê mişk û koremişkan. Paşî gotarên xwe yên 10-15 sal berê derxistin bê çawa roja îro dîtine. Tebîetê wê ye, divê her tiştî bizane!

Tirsa ji derve hatî, wek barbaran e, xwediyê heman fonksiyonê ye. Vê carê ji wê Çîna ku Hejar Mukiryanî digot "Selam ey hêza selama Çîn" hat. Bi rêya Endilusa berê, Yewnanistana Cavafy û Îtaliyaya Buzzati hat naverasta bejahiyê. Vê carê peravên Deryaya Spî bûn deriyên mirinê.

Vê carê, xwemalî dê kelehên xwe yên nû li peravên Deryaya Spî ava bikin. Vê carê sînor dirêjtir bûne. Lê vê carê Ewropa jî mezintir e, Amerîkaya Bakur jî lê zêde bûye.



Pieter Bruegel the Elder, "Serkeftina Mirinê", 1562



Mem Avba

# Korona û yekrêziya kurdî

Rojeva tevahiya cîhanê nexweşiya Korona ye ku êdî weke kerasetеke mirovî tê pênasekirin. Cara yekem e ku nexweşiyeke wiha dibe pirsgirêka tevahiya mirovahiyê. Mirovahî bi yekdestî niha li dijî vê kerasetê, di nav têkoşîn û hewldanên derketina ji vê reş-êşiyê. Tevahiya cîhanê mijar û rojevên xwe yên siyasî, aborî, bazirganî hwd dane aliyekî, li dora rojeva Koranayê di nav nîqaş û lêgerînan de ne. Ango vê nexweşiya bêyom tevahiya rojeva mirovahiyê dagir kiriye.

Di demeke wiha de ku her kesî nakokiyên xwe dane aliyekî û li dijî vê kerasetê têdikoşin de, pêwistiya yekrêziya Kurdî ji her demê zêdetir derdikeve holê. Niha ji her gavê çêtir pêwistiya alî û enî, hêz û saziyên Kurd ên çar beşên welêt heye ku li hev kom bin, têkilî deynin, tifaq û danûstandinên xwe zêdetir bikin. Nexasim hêz û aliyên siyasî divê vê bi awayekî ciddî, bêyî ku ti hincet û sebeban derînin pêş, di çarçoveya çarenûsa neteweyî-mirovî de bêne ba hev û planeke giştî ya çareseriyê deynin pêşiya xwe.

Lewre ji niha de nexweşiya Korona bêyî mijarên siyasî û îdeolojîk û mirovî binêre, li çar aliyên Kurdistan û herêmê di asteke metirsîdar de pêş dikeve. Ji ber siyaseta dewletên serdest a Tirkiye, Iraq, Îran, Sûriye û zilhêzan ku her tim civaka me di jêrdestî û rajêriya xwe de girtine û wisa nêz bûne, sîstemeke tenduristî ya têkûz çênebûye û van hêzan nehiştiye ev derfet ji derkeve holê. Ev nêzikatiya sîstema desthilatdar a li ser civaka me, ji her demê zêdetir di vê dema ku vê nexweşiyê eman ji xelkê standiye, bandora xwe li ser gelê me zêdetir dike.

Ji ber van sedemên me behs kirî, erk û berpirsyariya exlaqî, mirovî, çandî, tenduristî, siyasî û bîrdozî dikeve ser milê hêzên pêşeng ên di nav civaka me de xwedî gotin, angaşt û bandor in. Çi li Bakur, li Başûr, çi li Rojhilat û Rojava û çi jî li derveyî welêt ev erk li ser milê van derdorên navborî ye.

Weke tê zanîn ji bo ev nexweşî ji ser Çînê re derbasî Îranê, Rojhilatê Kurdistanê bû, bandoreke mezin li gelê me yê Rojhilat kiriye. Herî zêde jî civaka me ya bê derfet û bê parastin bi vê kerasetê rû bi rû dimîne. Ev nexeşî tenê bi Rojhilatê welêt re jî sînordar nemaye û ji ber hevsînoriya bi Başûrê welêt re, heman awayî civaka me ya Başûr pê re rû bi rû dimîne. Dîsa bi heman awayî ji ber hevsînorî û danûstandinên bakurê welêt ên bi Başûr û Rojhilatê welêt re nexweşî lê bi bandor dibe û her ku diçe civakê bêzar, bê mecal dihêle. Ji bo ku ev demeke dirêj e Rojavayê welêt bi êrîşên dagirkeran re rû bi rû ye û hatiye dorpêçkirin ne xwedî derfet û mecaleke tibbi-tenduristî ye ku bizane ev nexweşî di heye yan na, yan jî di kîjan astê de ye. Ango ne diyar e ka ev beşa welêt jî dê kengê weke beşên dîtir bi vê nexweşiyê re rû bi rû bimînin.

Çawa ku vê nexweşiyê hiştiye tevahiya cîhanê çarenûsa xwe bike yek û têkoşîneke hevpar bike, gelê Kurd, hêz û rêxistinên wê jî divê bi heman awayî çarenûsa xwe bike yek. Jixwe ji bilî wê jî ti çareyek nîne. Lewre ji niha de rû bi rûmayîna bi vê nexweşiyê ya her çar beşên welêt, neçar dike ku Kurd bêyî nakokî û cudatiyan bên ba hev û bi yekrêzî li dijî vê kerasetê têbikoşin. Ti hêviya civaka me ji desthilatdar û serdestan nîne ku tiştekî bike. Di vê rewşê de jî gelê Kurd dimîne ber rehma dagirker û mêtîngeran.

Her çiqas li Rojhilatê Kurdistanê yekeyên xweşbexş ên civakê çêbibin ku alîkariya mirovî bigihînin malbatan; li Başûrê welêt karsazên Kurd ên bihistiyar hatibin ba hev û bikarin alîkariya civakê bikin; dîsa li beşên dîtir ên welêt qedexeya çûn û hatinê hatibe ragihandin jî, ji encamên derketî holê nîşan didin ku bi vî awayî pêşî li vê nexweşiyê nikare bête girtin. Her diçe li derdorên berfirehtir bandor dike û dibe sedema mirin û têkçûna sazûmaniya civakî. Ji bo wê jî di asta neteweyî de planeke berfirehtir a hevgirtin û tifaqa navxweyî ya Kurdî pêwîst e.

Ji ber polîtîkayên serdest û dagirkeran ku hem rasterast êrîş kirî, hem jî bi destê çeteyan li dijî civaka me şer kirî, li Kurdistan û herêmê hilweşîneke mezin a civakî pêk hatiye. Ji Rojava heta Bakur û Rojhilat û heta Şengalê ji gelek deveran xelkê me neçar maye koçber bibe û niha li Başûrê welêt di kampan de di mercên dijwar de dijî. Ev jî nîşan dide ku heke nexweşiya korona di nav civaka me de zêde bibe û li van deran bandor bike, dê bibe sedema felaketeke civakî, neteweyî û mirovî!

Di demeke wiha de ku metirsiyeke mezin li ser civaka me heyî, li Başûrê welêt geşedanên sosret pêk tên. Ango di navbera du hêzên Kurdî de (PDK û YNK) nakokî û rageşiyeke bêwate û bêwext rû daye. Mijar her çiqas weke mijareke 'ewlehî-asayîşî' bixuyê jî, ev her du hêzên sereke yên Kurdî li ser kontrolkirina rêyên herêma Qendîlê di nav rageşiyeke metirsîdar de ne. Lê belê ev rojeveke sunnî ye. Lewre jixwe niha herêma qendîlê ji aliyê hêzeke Kurdî ya dîtir ve (PKK-gerîla) tê parastin û pirsgirêkeke wê ya ewlehî jî nîne. Dîsa hin alî û derdor ji bo vê aramanca xwe pêk bînin, diçin bi dewleta Tirk re rûdinin û hevdîtinên nepenî û sergirtî pêk tînin. Dewleta Tirk dixwaze hêzên Kurdî bîne pêşberî hev û nakokiyan kûr bike.

Ev jî diyar dike ku ji bo hêzên dagirker ên Kurdistanê ti rewşên keraset û felaket ferq nake û çi dibe bila bibe dev ji neyartiya gelê Kurd bernade. Li pey plangerî û fitneyên ku hêzên Kurdî bîne beranberê hev, bide şerkirin. Lewma jî civaka me di van mercên ewqas metirsîdar de bi kerasetên mezintir re rû bi rû bihêle!

Em bawer in ku alî û eniyên Kurdî jî van komplo planên xêrnexwaz û neyarane dibînin. Lewma ji her demê zêdetir pêwistiya gelê me heye ku rêxistin, sazî û dezgehên Kurdî yên pêşeng û xwedî bandor nakokiyên xwe deynin alîkî bên ba hev, ji pirsgirêkên gel re bibin bersiv. Divê rojeva hêzên Kurdî ew be ka dê çawa li dijî vê nexweşiya korona civaka xwe ji her aliyî ve biparêzin û yekrêziya xwe pêk bînin.

# Mirinekê hezar mirin bi xwe re anîn

## Pergalên aborî, tenduristî û civakî li hemberî vîrusa koronayê têk çûn. Mirovayî bû qurbana bê tedbîrî û xemsariya dewletan

Navenda Nûçeyan

Vîrusa koronayê di 1'ê kanûnê sala 2019'an de li bajarê Wuhan ê Çînê derket holê û belavî seranserê cîhanê bû. Di serî de wekî zature hat pênasekirin lê piştî ku nexweş bi tedawiyê baş nebû navê wê kirin 2019-nCoV ango vîrusa koronayê. Gelo çawa derket, çima belav bû, çima ev qas kes pê mirin, çima di serî de heta îro tedbîr nehatin girtin? Ev pirsên sereke ne. Ligel bersiva çend pirsan tên dayîn jî hin pirs jî nayên bersivandin.

Di serî de vîrus wekî rîskek nehat dîtin û her roj tenê daneyên Çînê hatin parvekirin. Çîn her ku diçû dibû rojeva sereke ya cîhanê lê îro jî hemû welat bûn rojeva sereke ya cîhanê. Rayedarên Çînê di serî de ji bo aboriya dewletê bi awayekî cidî nêzî rewşa heyî nebûn û ev tişt jî bû destpêka rêwitiya belavbûna vîrusê ya li tevahiya cîhanê. Piştî ku bîlanço giran bû Çînê dest bi tedbîrên giştî kir.

Di 11'ê sibatê de jî Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) bi belavbûna vîrusê re li seranserê cîhanê rewşa awarte ragihand. Dewletên netewperest, nijadperest, olperest û zayendperest û bi taybetî jî dijminatiya ekolojiyê dikin li hemberî vîrusê hejiyan. Zîhniyeta serdest a ku rastî veşart, xemsar nêzbû, têkiliyên xwe yên aborî parast û tedbîr negirtin, civakê bi vîrusê re rûbirû hiştin.

### Dewletên 'pêşketî' têk çûn

Gelek dewlet bi aboriya yekparêzî û hêza xwe ya leşkerî li cîhanê dixwestin bibin serdest, hemû stratejî, plansazî, dagirkirin û şer li ser vê yekê hatin organîzekirin. Lê korona li hemberî hêz û azweriya dewletan bû frenek. Vîrusa cîhanê tehdît dike pergala tenduristiyê ya dewletên 'pêşketî' raxist ber çavan. Gelek dewlet di hêla reform û pergala tenduristiyê de xwe wekî mînak nîşan didan. Di rewşa îro de dewletên 'pêşketî' deşîfre bûn û têk çûn. Nexweşxane, ekîpman û amûrên tenduristiyê êdî têra nexweşan nakin.

### Welat û welatiyên xizan…

Korona bû sedema xitimandina aboriya dewletan jî. Dewlet ji bo aborî têk neçin têkiliyên xwe domandin û guh nedan xetereyan. Piştî rewşa xeternak, dewlet sînorên xwe ji hatin û çûyînê re girtin, danûstanên xwe yên bi dewletên din re kêm kirin. Hem di navbera dewletan de û hem jî di nav dewletan de krîza aboriyê li pêş ket. Welatên ku niha di bin tesîra vîrusê de ne her roj daxuyanî didin û pakêtên nû yên aboriyê ji bo welatiyên xwe aşkera dikin. Pakêtên hatin aşkerakirin tenê berjewendiyên karsaz û dewlemendan parastin.



Welat û welatiyên xizan di hêla aboriyê de bê parastin hatin hiştin. Welatên xizan û welatiyên xizan wekî her car dîsa bûn qurbanên sereke.

### Mirov bûn qurban

Gelek dewlet bi belavbûna vîrusê re tedbîrên cur bi cur girtin. Maseyên krîzê, komîteyên krîzê hatin avakirin. Bi giştî hemû welat sînorên xwe girtin û rêwitiya di navbera welatan de hatin sekinandin. Li hinek welatan qedexeya derketina derve, rewşa awarte û herêmên karantînayê hatin ragihandin. Dibistan hatin girtin, mîhrîcanên muzîk, fîlm û şanoyan li seranserê cîhanê hatin betalkirin. Organîzasyonên aborî hatin taloqkirin. Musabaqayên futbolê û hemû aktîvîteyên sporê yên cîhanî hatin betalkirin. Televîzyon, radyo û malperên înternetê bi bernameyên cuda bangewaziyên hişyariyê kirin. Heke di destpêke de ev qas tedbîr bihatana girtin ev qas mirov nedibûn qurbanên berjewendiyên dewletan. Her mirinek hezar mirin bi xwe re anîn...

### Ewropa bû navenda vîrusê

WHO'yê, diyar kir ku navenda vîrusê niha Ewropa ye. Yek ji wan Îtalya bû. Di serî de rayedar û piştre jî welatî xemsar nêzî vîrusê bûn. Di nav welatên Ewropayê de cara yekem Îtalya herêma Lombardiyayê xist karantînayê û pişt re jî çarçoveya karantînayê fireh kir. Herî zêde qada tenduristiyê ya Îtalyayê bi zehmetiyan re rûbirû man.

### Artêş ket dewrê

Li Fransayê hinek deveran biryara qedexeya derve hat dayîn. Ji ber ku kapasîteyên nexweşxaneyan tije bûn artêşa Fransayê nexweşaneyên xwe ji gel re vekirin. Ji ber rewşa giran artêş ket dewrê û li gelek cihan dest bi kontrolê kir. Ji bo welatiyên xwe yên din biparêzin ji bo bêmalan navendeke giştî hat vekirin. Her wiha Kanadayê jî ligel tedbîrên tenduristiyê tedbîrên aboriyê girtin û ji bo karker, xizan û kargehan bûdçeyek hat veqedandin. Li Elmanyayê kombûna koman hat qedexekirin û banga parastina nevberdanîna civakî hat kirin.

### Sûcdar kir lê tedbîr negirt!

Li dijî vîrusê li Amerîkayê 'Rewşa lezgîn a neteweyî' hat ragihandin. Seyahatên li Ewropayê hatin sekinandin. Li New York, Washington û Californiayayê muhafizên neteweyî ketin dewrê. New York wekî cihê pandemiyê hat ragihandin. Êdî li Amerîkayê amûr û ekîbên tenduristiyê têrê nakin. Serokê Amerîkayê Donald Trump her tim Çîn sûcdar dikir lê di hêla tedbîrgirtinê de jî serê xwe neêşand.

Îngîlistan di hêla aboriyê de li cîhanê di rêza 5'emîn de cih digire, lê tenê li hemberî vîrusê bangewaziya ji malên xwe dernekevin da. Ji ber qelsbûna tedbîran welatî bi tund hikûmet rexne kir.

### Qedexeya derketina derve

Piştî Îtalyayê welatê herî zêde bi bandor bû jî Îspanya ye. Li Îspanyayê nexweşxaneyên taybet dewrê pergala giştî ya fermî bûn. Li Belçîka, Yewnanistan û Awusturyayê biryara qedexeya derketina derve didomin. Li başûr û bakurê Koreyê gelek tedbîr hatin girtin 'Herêmên taybet ên afetê' hatin ragihandin. Ji ber xemsarî û tedbîrnegirtina hikûmeta Japonyayê welatî nerazîbûnên xwe nîşan dan. Li Rusyayê jî wekî welatên din tedbîrên giştî hatin girtin.

### Rewşa awarte ragihandin

Îran jî wekî Çînê demek dirêj di rojevê de ma. Ji ber bêtedbîriyê bedeleke giran da. Ligel karaseta mezin dîsa jî ambargoya li hemberî Îranê berdewam kir. Li Lîbyayê seferberî û rewşa awarte, li Tunusê karantîna, li Sirbistanê rewşa awarte û li Qibrisê jî biryara qedexeya derketina derve hat ragihandin. Iraq li dijî vîrusê di serî de deriyên xwe yên sînor girtin. Li Erebistana Siûdî tenê êvarê derketina derve hat qedexekirin. Li Sûriye, Îsral, Filistîn, Lubnan, Yemen, Fas, Ezerbeycan, Bosna Hersek û Hindistanê tedbîrên qismî hatin girtin.


# Nivîseke balkêş





Rohat Alakom

Nivîseke Eznîva Reşîd ku di roja 8/3 1962an de di rojnameya Rêya Teze de hatiye weşandin ji çend aliyan ve balkêş e. Eznîva Reşîd (1922-2000) bi salan wek bêjer (spîker) di Radîyoya Rewanê de kar kiriye. Di salên xwe yên dawîn de di fîlma "Kilamek ji bo Beko" (1992) de jî cîh girtiye. Li ser koçkirina Eznîva Reşîd re îsal bîst sal derbas dibin. Ew, jina Xelîlê Çaçan Mûradov û dayîka rojnamevan Têmûrê Xelîl e. Eznîva Reşîd di vê nivîsa xwe ya kurt de 8 Adarê, roja jinan ya navneteweyî pîroz dike, bona hemcinsên xwe yên ku di Radîyoya Rewanê de wek dengbêj, stranbêj û muzîsyên kar kirine tiştine baş dibêje û li ser pêşketina wan disekine. Di nivîsê de navên çend stranbêjan jî dide. Ev nivîsa ku berî 58 salan hatiye weşandin wek mesajek, peyamekê jî dikare bê hesibîn. Nivîs di warê dîroka pîrozkirina Roja Jinan ya Navnewteyî de dokumenteke balkêş e. Ev nivîsa Eznîva Reşîd hewa û atmosfera polîtîk ya wan salan jî bi vekirî dide der, nîşan dike. Ez qet têkilî zimanê vê nivîsê nebûm, li jêr latînîya tekstê wek xwe diweşînim.


Дотед к'ӧрда дәрһәqа р'ожа хwәйә иройинә бәхтәwарда дьстрен

## Dotêd k'urda derheqa roja xweye îroyîne bextewarda distrên

*"Çiqas r'oje p'êlêd r'adîoê ser deşt û zozanar'a, gelî û gebozar'a, ç'ya û banîyar'a bi hezara kîlomêtra r'ê dibir'in û dengê diktor û dengbêjêd me dighînine welatêd dûr û nêzîk, r'adîoguhdarêd me.*

*Nava dengê wan dengbêjadanin usa jî dengê qîz û k'ulfetêd k'urd, kulfeta k'urd, ya ku berî qeydê sovêtîê nava belangazîê û zelûlîêda bû û îro welatê sovêtîêda bûye uzva mexluqetîêye t'am, xweya r'isqet û îzna xwe.*

*Ji guhdarvanêd me k'ê Sûsika Sîmo, Belga Qado, K'ubara Xudo, Zadîna Şekir, Asa Avdal, Naza Kokil, Seyrana Musa û gelekêd mayîn nas nake, êd ku bûne h'izkirîê guhdarvana. Çiqas h'eftêye ji r'adîoguhdara bi deha name têne stendinê, wekî dengbêjêd qîz wanar'a k'lama bistrên.*

*Ewana k'lamêd derheqa Lenînê mezin, Partîa Komunîstîeye azadar, derheqa emrê xweyî îroyînî bextewar, derheqa xebatêda, merivêd xebatkarda, qeydê kolxozîêda distrên û usa jî k'lamêd bengîtîê, govenda, mêranîê dibêjin.Gelo ji r'adîoguhdarêd me k'ê k'lama "Kolxozêd me kanîne" nebîhistiye, ya ku koma qîza distrê. Vira qîzêd k'urd derheqa e'mrê xweyî t'êr û t'ijîda, derheqa emrê kolxozîêda distrên û dibêjin, wekî kolxozêd wan kanîne, li deşt û zozana danîne, kîlerê wan t'ijîne, xebatçîêd wan jî cindîne.*

*Îro r'oja 8-ê martê em çawa h'emû jinar'a, usa jî omîdêd xweye dengbêjr'a açixîêd xebatê dixwazin û dibêjin: derheqa emrê meyî bextewarda dha kubar û blind bistrên dotêd k'urd…Bra dengê we çar qulbê dinê belabe û her yek bizanbe, wekî cimae'ta sovêtîê çawa dixebite, dijî û ax'rîya merivayêye nûr-komunîzmê çêdike"*

**Eznîva R'eşîd**

(Dîktora xeberdanêd r'adîoêye p'ara k'urdî)



Reyhan Îke

# Rîwayet û rastî

Ji mehan heyva gulanê bû; berfa zozanan diheliya, avên çem û rûbaran boş bûbûn. Sibê zû rabû ser xwe, cotek nan û hinek pêxwarin kir nav paçekê û li çelteyê xwe dagirt. Paşê çelteyê xwe da milê xwe, babê xwe da pişta xwe û berê xwe da Kelha Gurdêlê.

Kelha Gurdêlê li herêma Botan, geliyê Goyan e. Kelhe di navbera sînorê başûr û bakurê Kurdistanê de ye. Di dîrokê de hemû kelhe bi şer û lehengiyan tên nasîn. Lê kelha Gurdêlê li herêma Botanê bi taybetmendiyek xwe ya din jî tê nasîn û bibîranîn. Ava Hêzil û çemê gundê Roboskê li jêrî Kelha Gurdêlê digihêjin hev. Ji serê kelhê heta digihêje avê tehtek bi qasî sêsed metreyan bilind heye. Hindurê vê tehta bilind wekî botekê ye. Bot navê amûrekê ye ku tê de alif didin pez. Hundirê daran tê qewartin, wekî amûra alifxwarina pez tê bikaranîn. Serê vê botê digihêje nava çem.



Li gorî riwayetekê bi sedsalan berê vî camêrê me li jorê behs kirî jî wekî dewama kevneşopiyekê babê xwe daye pişta xwe û berê xwe daye vê kelhê. Piştî kur û bab ji malê derdikevin, kenek li bab peyda dibe. Dike nake nikare kenê xwe rawestîne. Kurê wî yê di xwihdanê de mayî, westiyayî û ji westanê nikare henase bigire ji kenê babê xwe matmayî dimîne. Piştî meşa bi saetan şûn de, êdî hew xwe digire û ji babê xwe dipirse, "babo, tu çima ewqas dikenî? Tu dizanî em ji hev qut dibin, ji ber rêzdariya xwe bi saetane min ji te nepirsî. Lê êdî bese, ka sedema kenê xwe ji min re bêje."

Kemek maye wê bigihêjin kelhê û ber bi nîvro ye. Zilamê kal keserek kûr dikişîne û ji kurê xwe re dibêje, "ez bi xwe û te dikenim kurê min. Heta niha ti mirovî nekariye ji pîrbûn û kalbûnê bireve. Min jî wekî te beriya bi salan babê xwe da pişta xwe û anî heman cihî. Îro te ez dame pişta xwe, ev bi saetan e tu min hildigirî û dibî Kelha Gurdêlê. Dema ez ciwan bûm min ev nezanî, lê niha ez bi halê xwe û te dikenim. Ji bîr neke, wê sibe kurê te jî te bide pişta xwe, paşê neviyên te kurê te bidin pişta xwe û bînin. Wê bi vî awayî Kelha Gurdêlê hêj bibe cihê gelek serpêhatiyên wekî ya min û te." .


Li gorî riwayetê hinek qebîleyên herêmê kal û pîrên xwe dibirin û di tehta Kelha Gurdêlê de, di wî cihê wekî botê de diavêtin xwar. Ji bo av wan li ber xwe bibe, piranî heyvên ku av boş, an ku biharê dibirin. Piştî vê serpêhatiyê û şûn de, zilamê ku babê xwe ji bo avêtinê birî, babê xwe paş ve vegerandiye û piştî wê êdî dawî li wê kevneşopiyê hatiye.

Bêguman ev rîwayetek e. Ez di wê baweriyê de me ku rastî tam berevajî vê riwayetê ye. Di serdemên berê de awayên vegotinan mîtolojî ne. Dibe ku ev çîroka seyr li ser nirx û bihaya ezmûna kal û pîran hatibe gotin. Ji bo biçûk bikarin rêza mezinên xwe bigirin, ev çîroka seyr wekî amûra vegotinê hatiye hilbijartin. Ji xwe exlaq û dada civakî ne nivîskî, bi devkî ne û her bûyerek dibe bingeha dayîna rûniştkandina pîvanek exlaqî. Di hemû civakên xwezayî de nirxa ezmûnan bilind e. Bîra civakî bi riya mirovên pîr û kal tê veguhastin û ji ber vê yekê mirovên pîr û kal di civaka me de xwedî nirx û rêzdayîneke mezin in. Tevî pêşketina kapîtalîzmê û gihiştina şêweyê jiyana wê ya hemû deverên cîhanê, di civaka me de pîr û kal di nav avahiya çandî de xwedî gotin in. Di civaka me de bi siyaneta ji mezinan re tê dayîn, biesilbûn û exlaqbûna mirovan tê pîvan û siyaneta ji mezinan re hêj jî cihê pesindariyê ye.

Ji xwe dema em li neyîna aramxaneyan an ku di xwe de malên huzurê yên li Kurdistanê binêrin, wê bê dîtin ku tevî hemû êriş û hewldanên tinekirina çanda me, çanda me ya civakî hêj serwer e.

Rastî ev e ku wê rojek bê û em hemû li rastî qonaxa pîr û kalbûnê bên. Ev di jiyê mirovan de qonaxek xwezayî ye û li pêşiya me hemûyan e ger em zûtir nemirin. Ji ber pîrbûn piranî wekî kombûna ziyanê ya di organ, raçînk û şanikên laşê me tê pênasekirin. Di encama van de erzing biçûk dibe, rah diqermiçin, çerm sist dibe, hestî nazik dibin, kirkirk zirav dibin û gihik diwerimin; damar dixetimin û hişk dibin, por spî dibe, windabûna dîtinê çêdibe û hiş û bîr lewaz dibe. Lê yek ji van jî nirx û bihaya mafê bi rûmet jiyankirinê ji dest me nagire û divê negire.

Em van rojan jî qonaxek nazik dijîn û vîrusa koronayê cihan daye ber xwe. Ev vîrus herî zêde bandorê li kal û pîran dike. Nêzîkatiya me ya ji kal û pîrên me re çawa be, wê ev nêzîkatiya nifşên nû ya ji me re diyar bike. Ya rast ti vîrus bi qasî nezanînê zerer û ziyanê nade civakan. Em çiqas di zanebûna çand û pîvanên civaka xwe yên exlaqî de bin, piştgirî û alikariya hev bikin û van nirxên çanda xwe ya civakî biparêzin, wê civaka me ewqas tendirust bimîne. Bi vê wateyê çîroka jor xwedî wateyeke mezin e. Dibe ku ji bo zarokan çîrok be, lê di rastiyê de ji bo mezinan wane û dîrok e. Bi hêviya em pîr û kalên xwe, bîra civaka xwe biparêzin, nirx û rûmeta wan biçûk nexin, rojên şad û tendurist hêvî dikim ji bo hemû mirovên nirx û rûmeta mirovbûnê diparêzin.



# Ziwan ma resneno roja felatî

Lazim o ke kirmancî xo ser o, xo bi xo bixebitê. Tora ziwan û çanda kurdkî ra teber ganî kirmancî bêrê têhet torêka xosere awan bikê. Serdestê ke gala ziwan û kulturê kurdan kenê, goreyê îdeolojî û fikre ma cîyayî nêdefînenê mabênê ma

Serhat Kiliç

Seke şima zanê tora (network) ziwan û kulturê kurdkî verê çend mengan Amed de ameye têhet. 300î ra vîşêr delegeyê ke xeylî şaristanan û tewir bi tewir sazî û dezgehan ra ameyîbî estbî. Nê kombîyayîşî de 12 maseyê tematikî ameyê weçînayîş û nê temayan ser o komxebatî virazîyayî. Biraştî zî delegasyon û şarî ser de yew sînerjîyêko gird piro na. Xora na tore gelekî bale ante û dekewte rojevê şarî, hewce nêkeno ke ez derg û hîra behsê tedeyîya aye bika. Ez wazena tîkê hetê kirmanckî ra bîewna na tore ro.

Heme maseyan de hûmara xo bes nêbo zî beşdarê kirmancî estbî. Beşdaran goreyê temaya xo tespît û peşnîyazê xo vatî labelê çi heyf o ke rewşe tîya de xo da teber. Her çend ziwanê komxebatan kurdkî bo zî dîyalekto serdest kurmanckî bi, coka kirmancê ke qîseyî kerdî nêameyê fehmkerdiş. Raporê komxebatan hetê kurmancan ra pêro bi kurmanckî ameyê nuştiş, tespît û peşnîyazê bi kirmanckî seba ke fehm nêbîyê raporan de yan binde ca nêgirewtî yan zî kêm û xelet ca girewtî. Xora tayê kirmancan neçar mendê û înan bi kurmanckî qisey kerd.

Seke mi resim ard verê şima, rewşe wina bî. Nika ma ganî tîkê sebeban ser o vinderê. Helbet tîya de kesê ke na tore piro naye û hadirekerê kombîyayîşî sucdar nîyê. Ma nêşênê çi kird çi kirdas beşdaran zî sucdar bikê. Tebîetê na mesela wina yo. Bakur de heme xebatê ke pîya (kirmanc û kurmanc) benê bi serdestîya kurmanckî vîyarenê. Zaf rayan seba ke na rewşe bivurîya gamî erzîyayê la reyna zî kirmanckî tim sey yew rengî mende, nêbî esasî. Mi na tore û gelekî wareyanê binan de dî ke xebatê ke pîya benê encamanê serkewteyan nêdanê. Ez xelet nêyera fehmkerdiş, nêtê mi o nîyo ke heme xebatê ke heta ewro bîyê ez înan veng û bêhavil binawna. Vatişê mi o yo ke zaf rey ma cerebna la hendo ke ma wazenê, ma ê encaman xo dest nêkenê, coka ma ganî rayîr û raybazanê xo bivurnê. Probleme kirmanckî cîya yê, rewşa kîrmanckî cîya ya coka ganî têkoşînê kirmanckî zî cîya bo.

Lazim o ke kirmancî xo ser o, xo bi xo bixebitê. Tora ziwan û çanda kurdkî ra teber ganî kirmancî bêrê têhet torêka xosere awan bikê. Bi na tore her cayê welatî de rewşa kirmanckî bêro tespîtkerdiş. Na tore hewl bida ke yew polîtîkaya pêroyî ya ziwanî awan bika. Teyna gramer, nuştiş û wendiş nê, înan ra teber hewl bida ke verba asîmîlasyonî mîyanê komelî de yew hîşmendî viraza. Hetê serdestan ra polîtîkaya asîmîlasyonî hema zî dewam kena labelê nê polîtîkayan ra teber êdî şar vîyerto merheleyêko bîn, hewceyê xo bi serdastan çin o, êdî xo bi xo, xo asîmîle keno. No zî mojneno ma êdî çi xebatî benê ganî mîyanê şarî de bî, mîyanê komelî de bî. Çunke otoasîmîlasyonî de dişmen êdî kesêde bîn nîyo, ma bi xo yê.

Gelekî sînayoxê ziwanî estê ke nînan xo rê kenê derd û wazenê xizmetê nê ziwanî bikê labelê vilabîyaye yê. Hewceyê yew koordînasyonî esto ke nê hêzanê vilabîyayeyan bîyaro têhet, sînerjîyêko pîl virazo, planan bido verê xo, yew programî reyra xebatan biko û nînan teqîb biko. Yew tore şêna nê koordînasyonî bika. Ê yê ke bi ziwanî ya elaqedar ê binê banê na tore de şênê ca bigêrê û kar bikê. Yanî na tore şêna ziwan û kulturê kirmancan ser o biba yew otorite. Ez zana çekûya otorîteyî zaf weş bi ma nêşona labelê qestê mi otorîteyêko teber ra û cor ra yeno nîyo, o yo ke ma bi xo û bi hawayêdê demokratîkî anê meydan, o yo.

Ez wazena yew nimûneyî reyra mesela tîkêna bika zelal. Êdî şar wextê xo zafane înternete ser o vîyarneno, wendiş û nuştişî ra vîşêr vîdeoyan temaşe keno. Çi heyf o ke înternete de vîdeoyê bi kirmanckî gelekî kêmî yê. Eke yew kome vejiya na babete xo rê bika kar, mavajê biwaza ke mîtolojîye ser o 10 vîdeoyanê kilman hedire bika. Çend kesî metnan bihedernê, ê yê ke komputere ra weş fehm kenê pê grograman montaj û xêzê vîdeoyan bikê, çend kesê bînî zî karê vengdayîşî bikê. Eke no kar bi hewayêkê profesyonelî bêro kerdiş berêko zaf erjîyaye ano meydan û bala şarî anceno xo ser.

Vatiş de çend asan bo zî, xo bi xo xebatê winayînî nêbenê. Coka ez vana ganî yew tora ma biba ke verê hemîn îxtîyacanê winayînan tespit bika, dima nê projeyan ser o qadro bivîna û heme çî ra ver sînayoxanê zîwanî motîve bika ke xebatî bi asanî û bi zerrî bîyerê kerdiş. Ez bawer kena ke pîyabîyîşê ma kemanîyanê ma wedarneno, xeta ke ma xelesnena na ya.

Serdestê ke gala ziwan û kulturê kurdan kenê, goreyê îdeolojî û fikre ma cîyayî nêdefînenê mabênê ma. Coka ma zî wareyê ziwan û kulturî de ganî cîyayî nêdekê mabênê xo, têkoşîn ganî pêroyî bo. Pêameyîşêko winayîn şêno bibo cewabê polîtîkayanê asîmîlasyonî. Wina ke bi ma şênê her het ra tesir bikê heme qismanê komelî. Ziwan û kultur bi nê qeydeyî beno awankerê yewitîye.

Mi cor de zî behs kerdbi, êdî ma kewtê merhaleyê xoasîmîlekerdîşî. Karê heme sînayoxanê ziwanî yo sereke komelî de afernayîşê hîşmendî yo. Ganî na mesela ferasetê çend kesan û çend dezgehan ra vejîya û komelî mîyan de vila biba. Belê, raşt o, teyna ziwan felatî nêano labelê ziwan ma resneno roja felatî.




# Gelo no bêtehemmulîya hemverê cenazeyan seba çi yo?



Merkezê Xeberan

Endama Grup Yorumî Hêlîn Boleke roja 288. ya rojeyê mergî de cuya xo vindî kerde. Boleke vera zextê dewlete de dest bi rojeyê mergî kerdbî û 288 rojan xover daye. Cenazaya Boleke ya ke bi vilikan ameye xemilnayene hetê cinîyan ra ameye wedartene.Endamê Grup Yorumî Îbrahim Gokçeko ke o zî rojeyê mergî de yo pê sandalîye tewrê merasîmê cenazeya Boleke bî û hemraya xo ra xatir waşt.Cenaze Kuçuk Armutlu ra ameye girewtene û ame waştene ke bêraCemxaneyê Okmeydanî.Polîsan waşt ke cenaze nêra Cemxaneyî.Çîyo ke merdiman dejneno oyo ke rojêka winasî de daxî fek hêrîşan nîno veradeyene û bi fermanê selahîyetdaran merasîmê cenazeyan yenî astengkerdene. Ganî bêro vîrvistene ke hêrîşan de xeylê kesî zî ameyî tepiştene.

Gelo no bêteemmulî seba çi yo? Pêroyê dinya rojanê xiraban ra vêrena. La reyna zî hîssanê nijadperestîye ra fek nîno veradayene. Kam beno wa bibo û merdim çi bawerî, îdeolojî û nijadî ra beno wa bibo, ganî cenazeyêk rê hurmet bêro nîşandayene. Tarîx ra heta ewro bêhurmetîya vera cenazeyan kerdenê îdarekaranê verênan ê.

## Dewey Ma



Cemil Oguz
cemilo@diyarname.com

### Bedenê ma ma ra çi wazeno?

Her merdim bedenêke cê est o. Çîyo muhîm oyo ke merdim senî bedenê xo şixulneno.Ma eyro serê bedenê merdimî de çende çî vacin û mesela biyarê heta ewro.

Heta ewro ma her vato ziwanê ma û ziwanê ma. La ma bizanin ke ziwanê bedenî zî est o. Beden bi nîşaneyan derdê xo ano ziwan, derdê xo mocneno ma.

Bedenê merdimî zehf nazik o, qaso ke nazik o, endêke zî xurt û xoverdêr o. Bedenê merdimî qaso ke beşko binê işkencî de xo ver bido xurt o, qaso verê vîrusêke qicî de nêşko xo ver bido nazik o. A xêza barî gere baş bêro zanayîşî û gorey aye beden bêro pawitiş.

**Hewn**

Pêdivîya bedenî bi henî çiyan est o. Pêdiviya bedenê merdimî bi hewnî est o. Roje de 7-8 saetî, la no hewn zî bi şewe, nê bi roje. Eke derdê merdimî bibê, ê derdî serey înan de zey morcelan şorê û bêrê merdim nê şewe nê roje eşkeno rako. A çaxî zî beden lawaz beno; bedeno lawaz beyray cê qeybi nêweşiyan akerdewo.Bedenê merdimî nişaney vecênê. Ê nişaney nişaneyê nêweşiyan ê. Ê nişaney zi caw lawaz ê bedenî de vecênê. Bi înan, beden ma ra vano bawne tîya pirsgirêk est o.

**Têgêrayîş**

Parçey bedenî, ma vacin mil, milê merdimî wexto deceno çînaw bîn, wexto çokê merdimî deceno çînaw bîn vano merdimî ra.

Wexto sere deceno çînan, wexto gurçikî decenê çînaw bîn.

**Rîçıqırnayîş**

Ziwanê bedenî de rîçiqirnayîş zî est o. Wexto jo rî xo çiqirneno çende çîyan mocneno ra: Ya hêrs bîyo, ya nêweş o, ya baro giroto we giran o.

Wexto jo hêrs beno xeberî nêdo zi bi têgêrayîşanê ci ma mesela fehm kenê. Wexto jo nêweş bo zî. Wexto jo pîzey xo pê bigîro zî. Ma zanê ke pîzey cê deceno.


**Werd**

Miyanê jiyaney merdimî de werd muhîm o. Merdim çi boro beden reaksîyon nişan dano. Zêde şekir boro bi nêweşî şekirî, zêde rûnin borê bi nêweşî kolestrolî, la ti tam çiyanê gorey bedenê xo ra borê zî beden ana hawneno to ra. Wexto çîyo "fabrîkasyon" merdim boro beden zehf aciz beno, çîyo organîk boro beden dilşa beno. Coka zî çîyê ma wenê zehf, zehf muhîm ê.

Bi kilmî ma vacê, qaso ma hawnenê ziwanê xo ra, ma qeybî ziwanê xo xebate kenê, ma wazenê ziwanê ma serê lingan de bimano, ziwanê ma raver şoro; qaso ma qeybî abori xebetênê, wazenê abori xo baş bikerê, gere ma endê ke zî bawnin bedenê xo ra, qeybî ê zi bixebetiyê. Ma wayir ro ê bedenî veciyê. Dewletî zi qaso pere qeybî tang û topan, balafir û fuzeyan xerc kenê, endêke qeybî merdiman, qeybî bedenê merdiman, qeybî weşîya bedenan xerc bikerê endêke go beşkê vernî vîrusan bigirî, beşkê însanan bikerê weş.

Semedo ma rojanê vîrusê korona ra derbas benê hawnayîş, wayir vejiyayîşê bedenî zehf muhîm o. Eke ma wayir ro bedenê xo veciyê, ma bedenê xo pak û merdiman ra dûrî bigirê ma go endêke beşkê ene îletey vîrusî xo ra dûrî bigîrê.

Enî heme çi zi bi aqil benê. Verînanê ma vato "Aqil taca zerdin a, serê sereyê her kesî de nîya." Ma a taca zerdine bigîrê û bidê serey xo. Bi a tace hem wayîrê bedenê xo veciyê, hem wayir ro şarê xo veciyê.




# Ez çêran bi kesên wiha dikim


Zilamek li gundekî Amûdê hebû, gelekî çêr, xeber ango sixêf dikirin. Gundî gelekî ji vê yekê bêzar bûn û çûn ba melayê gund. Ji melayê gund re gotin divê tu çarekê ji Hemo re bibînî gelekî zimanê wî lewçe ye û ew çêr û xeberan ji her kesî re dide. Biçûk mezin, jin, mêr, ciwan, kal ferq nake ji kê aciz bibe ew wî dide ber çêr û sixêfan.

Mele ji gundiyan re dibêje ka biçin vî Hemoyî ji min re bînin ez pê re biaxifim û hin şîret û wazan lê bikim. Gundî Hemo tînin ba melayê gund û mele dest bi şîretan dike. Hemo jî ji mele re dibêje: Seyda elehî kesê ku heq neke ez têkilî wan nabim lê kesê neheqiyê dike ez xwe nagirim û têra dilê xwe ji wan re çêran dikim.

Hîna mele û Hemo wî nîqaşê dikin zilamekî navsere tê û dibêje selamû elêkum. Mele dibêje xêre bira çi derdê te heye. Mêrik dibêje welehî seyda ez hatime ku tu fetwekê ji min re bibînî. Kurê min çû ber dilovaniya xwedê û ez dixwazim bûka xwe li xwe mehr bikim, ka binêre fetwa wê heye. Mele sor dibe, Hemo xwe nema digire û ji mele re dibêje seyda: ez ji kesên weke vî re çêran dikim û dike ku çêrên xwe rêz bike. Mele dibêje tu bisekine kurê min ê ku di devê bavê wî de bimîze ez im û mele êrîşî mêrik dike.



## XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3.Ne nêzîk 5.Saziyeke navnetewî 7.cureyeke gulan 8.Hejmarek 9.Navekî kuran 13.Henek 14.Belê 16.Cureyeke pereyan 19.Awa 20.Kurtasiya navê doktor 21.Kinceke dirêj 22.Çala avê 25.Ne tûj 26.Navê mehekê. 28.Raperîn

**JI JOR BER BI JÊR**

1.Paşnavê helbestkarekî kurd yê Rojava 2.Awayeke pêşandana fîlman 3.Daçekek 4.Madeyeke sereke di çêkirina xwarinan de. 6.Dengê baranê10.Alaveke şer yê kevin. 11.Xwezî, lava 12.Alaveke kevin ê ku rûn, dimis û tiştên malê tê de dihatin hilanîn. 15.Danekî rojê 17.Du zarokên ku bi hevre çêdibin. 18.xwarineke avî (berevajî). 20.Gundeke dîrokî yê girêdayî Nisêbînê. 23.Rengek 24.Diyariya herî bi nav û deng ku mirov didin hev. 27.neyênî

**Bersiva hefteya borî**



## Şûjin

**Dildarê Amedê**

# Bandora koronayê ya li ser jiyana me

Wekî hûn dizanin di van rojên belavbûna koronayê de ji bilî tirsa ji belavbûna wê gelek pirsgirêkên din jî tên jiyîn. Yek ji wan pirsgirêkên sereke mana li malê ye û xweparastin baş e lê gelek kes ji ber wê yekê ji karê xwe dibin. Di vê rewşa krîzê de windakirina kar û li malê betalî jî bi ser de moral û derûniya mirovan xira dike.

Bi ser de mayîna mêran li malê ji alî jinan ve wekî belayeke ji belaya koronayê xerabtir e. Dema mêr li malê dimîne pozê xwe dixe nav hemû karên malê û ew yek pirsgirêkên mezin bi xwe re tîne. Êdî heke ev pirsgirêka vîrûsa koronayê çareser nebe û demeke dirêj berdewam bike dê gelek jin û mêr hev berdin.

Wê rojê bûka me bi telefonê li hevjîna min geriya û jê re got bavê zarokan çi dike, ditirsim ji ciyê kar û çûn û hatina bi wesayitan ji were vê nexweşiyê bîne malê. Hevjîna min jê re got na na ew naçe kar li malê karê xwe hazir dike û dişîne ji ciyê kar re. Bûkê got ji aliyekî ve çavê wî ronî be, cihê kar biryareke baş daye lê ji aliyekî din ve xwedê alîkarê te be, dema li malê dimînin ji bilî karê malê îca daxwazên wan jî li ser zêde dibin.

Ez bi ser vê diyaloga wan de hatim û min got: "Xêr e çima xwedê alîkarê wê be bûkê." Bûkê got: "Wele dema hûn li malê ne, hûn pozê xwe dixin nava hemû karên malê û jin ji vê yekê gelekî bêzar dibin."

Min hinekî xwe xeyidand lê paşê ez fikirîm ku rastiya wê yekê jî heye. Lê hûn zanin ez tiştekî din ji we re bêjim. Ji bilî, tiştên neyînî yên ku vê nexweşiyê bi xwe re anîne, hin tiştên erênî jî hene. Bû 15 sal ku em zewicîne tu caran hevjîna min nanê malê ji me re çênekiriye lê ji tirsa derketina derve ne tenê nanê malê lê kulîçe jî ji me re çêkir. Ev jî yek ji feydeyên korona efendî ye. Aliyekî din ê baş ê vê nexweşiyê ew cudahî û ferqê naxe nava feqîr û zengînan û her kes para xwe jê digire.

Lê dîsa jî gelek desthilatdarî di vê rewşê de jî ketine derdê desthilatdariya xwe û her tiştî ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Lê bê guman cudahiyeke mezin di navbera deshilatiyan de jî heye, hin dibêjin xema nanê zarokên xwe nexun, li mala xwe bimînin û em ê hemû hewcedariyên we pêk bînin. Hinek jî dibêjin li malên xwe bimînin û destê xwe biavêjin berîka xwe û alîkariya me bikin.

Henek li aliyekî gelek kes û bi taybetî kurd, bi qerf û henekan nêzî vê meseleya vîrusa koronayê dibin lê bi rastî jî henek bi vê nexweşiyê nabin û divê mirov xwe baş biparêze. Heta niha kurdan jî gelek vîdyo û dîmen der barê koronayê de parve kirine û di tevan de jî bi qerf û henekan nêz bûne. Ji aliyekî ve ew yek baş e ji bo ku stres û tirsa xelkê zêde nebe û ji xwe ew taybetmendiya kurdan e ku her tiştê xwe bi qerf û henekan tînin ziman. Lê ji aliyekî din ve dibe ku ew sersariyekê bi xwe re bîne û mirov baş xwe li dijî vê vîrusê neparêze. Bi her halî ji we tevan re hêviya rojên xweş û azad dikim bimînin di xweşiyê de.

# Li ber çavan hildiweşe

**Dêra Surp Sarkîs a li Amedê ye ku ji bo gelê ermen gelek girîng e, bi saya wê em fêrî gelek agahiyan dibin. Dêra kevnar ji bêxweyîtî roj bi roj li ber çavan hildiweşe**

Aryan Med





Dîrok ne tenê bûyer an jî bermahî ne ku di paşxaneya demê de wenda bibin biçin. Bi kartêkeriya xwe ya li ser jiyanê her tim zîndî ye. Bi taybetî avahiyên dîrokî der barê serpêhatiyên gelan de pir tiştan dibêjin. Ew ji bîr û bawerî, zanist, ziman, estetîk û hwd. ya gelan nizilîne û heta roja me ya îro hatine.

Yek ji van avahiyên dîrokî, dêra Surp Sarkîs a li Amedê ye ku ji bo gelê ermen gelek girîng e û bi saya wê em fêrî gelek agahiyan dibin. Dêra Surp Sarkîs ji çar dêrên ermenan ên li Amedê dêrek e ku 500 sal berê hatiye çêkirin.

Dêra ermenan Surp Sarkîs ku gelê herêmê wê wek Dêra Çiltûkê jî bi nav dike, ji bêxweyîtiyê demek dirêj e bi tevahî li ber hilweşînê ye. Dîwarên dêrê bi kevirên reş ên Amedê hatine çêkirin. Dêra kevnar ji bêxweyîtî roj bi roj li ber çavan hildiweşe.

Çarmedorê dêrê vekiriye û ti bergirî ji bo ewlehiya wê xuya nabin. Hem li gor agahiyên kesên li derdorê dijîn hem jî meriv bi çavên xwe dibîne ku hin cihên dêrê hatine kolandin û hin dîwarên wê jî hatine xerakirin û kevir jê hatine derxistin. Tê payîn ku cihên kolandî ji aliyê defînegeran ve hatine kolandin.

Rêveberê Weqfa Dêra Surp Gîragos a Ermenan Ohannes Gafûr Ohanyan der barê rewşa dêrê ya niha , hewldanên wan ên ji bo jinûveçêkirinê û astengî û zehmetiyên li pêşiya wan de axivî. Ohanyan diyar kir ku dêra Surp Sarkîs di bin banê weqfa wan de ye û 30-40 sal in di rewşa niha de ye ku bi tevahî li ber hilweşînê ye.

**Dêr bêxwedî maye**

Ohanyan amaje pê dike ku heta şerê nav Sûrê yê 2015'an malek di hewşa dêrê de hebûye û wê malê xweyîtiyê li dêrê kiriye. Bi despêkirina şer re ew malbat jî ji neçarî mala xwe bar dike û dêr bêxweyî dimîne. Piştî ku kes namîne bergiriya dêrê bike kevirên dêrê tên dizînê. Ohannes Ohanyan ev rewş wiha anî ziman: "Xortekî 14 salî diçe kevir dikişîne kemera mezin bi ser da tê xwarê. Ew xort jî mirinê filitî lê ket qomayê. Ez bawer im ne karê wî xortî bû hinek ew şandine. Me ji walîtî û emniyetê re jî got. Me got qet nebe notirvanek deynin ber dêrê lê heta niha çareseriyek nehatiye peydakirin"

Ji bo çêkirina dêrê pir hewl dane lê dewlet xwe nedaye ber çêkirinê. Ji ber ku derfetên wan ên aborî rê nadin, ew nikarin dêrê çêbikin. Ohanyan diyar kir ku zagon û rêziknameyên heyî yên dewletê yên der barê kêmarên olî de rê nadin ku alîkariya kêmaran bê kirin û wiha got: "Dewlet dibêje ji ber ku tapo li ser we ye em çênakin, tapo bidin em çêbikin. Du dêrên me yên din jî hene di nav Sûrê de; dêra katolîk a ermanan û dêra protestan a ermenan. Ji ber ku tapoyên wan li ser dewletê ne, ew jî xera bûbûn lê çêkirin."

Ohanyan di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku ew bi Odeya Avahîsazan a Amedê û Odeya Bazirganiyê ya Amedê re axivîne, ji wan xwestine ku ji bo çêkirina dêrê hewl bidin lê hêj tu encam negirtine. Ohanyan anî ziman ku ew ji bo çêkirina dêrê berî qeyûm bavêjin serê, bi şaredariya mezin re jî axîne û şaredarî jî erênî nêzîk bûye lê piştî ku qeyûm hatiye êdî ew hêvî û bendewariya wan jî nemaye.

Ohanyan herî dawî bang li gel û saziyên civakî yên Amedê kir ku li dêrê xweyîtiyê bikin û got: "Dewlet dêrê çênake, dimîne saziyên civaka sivîl; mesela odeya bazirganiyê, a avahîsazan û hwd. kî dixwaze xweyîtiyê li vî bajarî bike. Amed bajarê me tevan e, divê her kes bibe alîkar."

**100 sal in wisa ye**

Hevserokê Odeya Avahîsazan a Amedê Ferît Kahraman jî der barê dêra Surp Sarkîs de axivî. Kahraman got ku dewlet ferq û meylê dixe navbera olan û ji ber vê nêzîkatiya cudaker dêra li ber hilweşînê ye, çênake. Kahraman ji bo rewşa wê ya niha wiha got: "100 sal in di halekî nebaş de ye. Niha kevirên dêrê jê derdixin. Bêxweyî ye û dora wê vekiriye. Ji bo parastinê tiştek nayê kirin. Ji ber tê xwarê bo jiyana mirovan jî xetere ye."

Kahraman amaje pê kir ku ew dixwazin dêr jinûve were çêkirin lê wek ode derfetên wan tune ne ku çêbikin. Her wiha Kahraman diyar kir ku ew hewl didin bi wan kes û aliyan re têkilî deynin ku dixwazin bin alîkar.

# Stranbêjekî ku kêm tê nasîn; Reşîdê Baso

Segvan Şingalî



Di sala 1926'an de li gundê Keleşbega li herêma tahlînê, li alî Ermenistanê, di malbateke êzidî de ji dayik bûye.

Reşîd di sala 2006'an de di hevpeyvînekê de ji Derwêşê Serhedî re gotibû kû 'pêşiyên me ji Dûtaxa Agiriyê hatine Qersê, ji wê derê jî, ji ber zilm û zora Roma Reş a li ser gelên êzidî û ermen derbasî alî Sovyetê bûne.'

Gelên koçber ji wê zilm û zordestiyê bi tenê canê xwe xelas dikin. Hinek tên kuştin û hejmarek kêm jî derbasî Komarên Ermenistan û Gurcistanê dibin. Belê ew ji tevkûjiyeke dîrokî rizgar dibin. Di salên destpêka koçberiyê de êzidî jiyanek sext û dijwar dijîn. Ji ber ku ola wan êzidiyatî ye, qedera wan jî tev li bextê gelê ermen bûye. Reşîd di sala 1946'an de dizewice.

Ji ber hestên wî yên niştimanî, azadxwazî û kurdewarî, di dema desthilatdariya Stalîn de Reşîd tê mişextkirin û şeş salan li Sîbîryayê dimîne. Bi mirina Stalîn re şûnve vedigere Ermenistanê.

Piştî salên 60'î reşîd diçe Radyoya Rewanê û dengê xwe yê germ di serê çiyayê Agirî re derbasî welatê bav û kalan dike. Di radyoyê de Reşîd bi dengbêjên mîna Şeroyê Biro, Karapetê Xaço, Efoyê Esed, Dawidê Xelo, Memoyê Silo, Egîdê Têcir û dehên din xeml û rewşa civata dengbêjên kurd digîhînin asteke herî bilind. Di radyoyê de ew dibin nûnerên nasnameya muzîka kurdî ya resen. Stranên ku Reşîd û hevalên xwe di Radyoya Rewanê de digotin, nîşaneya xerîbî û xûrbetiyê bûn û bêhna welêt û axê jê dihat.

Ferqa Reşîdê Baso ji hinek dengbêjên din ew bû ku wî piraniya stranên gotiye bi xwe afirandine û hin stranên wî jî hin hunermendên din gotine. Stranên mîna Felekê, Peyayo, Delal Ha Delal û hwd. Hunermendên mîna Şemdîn û Dilovanê kurê wî di berhemên xwe de stranên Reşîd gotine. Bila neyê jibîrkirin ku her dengbêjekî ji nav me koç dike arşîveke dewlemend jî bi xwe re dibe nav axa sar û ew kaniya stran û zanînê bi wan re dimiçiqe.

Hewce ye ku dema dengbêj hêj saxin arşîvên wan bên çekirin û stran û zanînên wan bên tomarkirin. Li ser wan berhem bên nivîsandin û çêkirin.

Her wiha Reşîd di jiyana xwe de gelek belengazî û feqîrî dîtine û ji bo debara malbata xwe 43 salan di kargehan de xebatiye. Di sala 2003'yan de ji bo çareseriya nexweşîyê diçe Ewropayê. Heta mirina xwe li wir dimîne.

Belê, hezar heyf dengbêjê nemir û kaniya stranên kurdî ya mezin û resen di 12'ê nîsana 2006'an de li Astanbroka Almanyayê koça dawî kir.

## Wêrane



Feratê Dengizî

# Wêrane, wêrane çi ye?

Yan jî gundeki kor, we qet gundê kor dîtiye?

Wisa gundekî mezin, li ser çar taxan, li ser sê newalan, li ser çar-pênc giran, lê kor! Xir û xalî!

Ka di tavheyvekê de em bimeşin. We go bekesî! Bêxwedîtî! Bêxwedî û bêXwedan! Wêran, wêranî, xerabe… Ê weleh jiyan zilm e. Kê gotiye jiyan pîroz e, hebûn pîroz e, de wir de, de here lo! De here ji xwe re karekî bike.

Qaşo taveheyv hestewariya dilxweşiya evînê ye. Mala mine! Va li ber Dara Zolê me. Berê keç û xortên dilevîn ji bonî ya dile wan bê cî, bigihên miradê xwe zolik bi vê darê, bi guliyên vê darê vedikirin. Zolikên sor, gulgulî, şîn, kesk… Tew, ku evin û meqseda dilan ma ji zolikan re, ji zolikên perpitî… Mala minê dilo, mala minê mirovahî, pîrozî. Kes nabêje jiyan pêkarî ye, hêzdarî ye.

Dile min, mejiyê min wêrane mîna warê min. Ka wê çawa be! Dildariya zarokî, ciwanî, kêfxweşî û lîstokên zarokîn ên li bin vê darê. Hevdana berûyan, xwarina sîtehlkan… Kuştina mar û gumgumokan. Deranîna hêkên niqniqorkê ji hêlînan û çavsoriya marên di hêlînan de. Lîstokên kortikan, qapan, deq, hisomeyn û herwiha. Herê Dara Zolê, herê dinyayê…

Destpêka ketina gund ji hela rojhilat ve, ji aliyê Stewrê. Vaye kêlika tirba kalikê min Hecî Izêr ê ku xwe spartiye tirba apê min Miheme û fatîheyekê dixwaze tevlî "vî şexsî, vî cebanî…" Tew lîstoka darçoqîtkan. "Şepo lîstika qîzan e. Em bi çilko bileyzin, lîstika kurikan, a meran!"

Vaye ciyê ku me bi deq ango xeleka berûyan dileyst. Vaye ber tirba jinxala min, ciyê gangilokan, ê gangilokên mor û rengên moravî, pêşî li vira difetiqin ji stûxwariya xwe, lê stûxwariya me didome. Gangilokên sor, spî, reş û hwd. li vê kêleka rê, li ber vê tirba xerîb, bêkes… Ev der cebanê xerîban e. Herê dile zarokî û bi ser de dile ciwan!

Rêya çalan, çalên Hemiya Şemdîn. Rebana xwa min Nûrê di vê rêyê de çi kişand û nekişand. Tew bi şev ez jî li ser pişta wê. Bêavî, ava çalan a baranê û kurmikên wê. De dilo bihêle lo… rebenî, tunetî, belengazî para me kurdan. Herê bindestiya malxerab.

Tavheyv îşev dildar e… Çi fêde war wêran e.

Qesra kalkê min wêran, ya bavê min wêrantir. Wexta me ew çêkir, li qubleyê wê me eyneyeke biçûçik î girover a xort û keçan di dîwêr de bi cî kir, min û Rifet.. Rifet jî koçber, xwecî, malwêran, dildar, evînqurmîçek, her bêqederî li bejnê tê, weke me. Hey gidî dinya, ew niha li ku ye! İlim jî esirkî ta ji Qarqosekê biriqîna wê dida her dere. Şewqa evîna nîvcomayan, nîvcomayiyan an jî ya yekalîtî yan jî evîna dîlê nîrê toreyan. Kilamên evînê diteyisand, denge Radyoya Erîvanê, Gerbêtê, Xaco, Meryamxan… dinimand. Ligel wê du kevokên ku nikul didan hev, maçî dikirin dilê kezidî.

Tev bûn çîrok!

Lê çi bi cam û pencereyan hatiye, çi li wan qewimiye. Yek jî nînin. Bi kêmanî sêsed û nizam çiqas mal, qesr û eywan, hêwan tev kor. Rohniya çavên wan nîne. Hela, hela… Qey ji ber tavheyvê ye.

Lê sibehê jî heman dîmen.

Ku tu ji derve yan jî ji hundirê gund, li gund dinêrî cam û pencere, pace vala ne, tarî ne. Ne cam ne pencere, ne takrîhan û ne kenê keçikên xama, ne jî li binya paçan xwe qurekirina xortên nûgihaştî ku av di wan de geriyaye. Xanî kor in û hilbet gund jî.

Gundê kor, wêran, wêrane.

Herê dilo!

Çi bibêjim vala, bê wate.

Li bende ye, li benda azadiyê.

Rewş wek kefareta azadiyê,

Herê!

Dê roj ji sere Gêra Aşan derbikeve û rohnayiyê bide pozê Devê Gur û Warkê Ereban. Dê çavên qesran jî ji rohnayiya azadiyê bibiriqin; ji kûrahiya terpîna dil, ji kûrahiya evînê…

***26.Adar.2017 / HepsaXopanaMêrdînê***
***D.12***
***Saet: 21.35***

# xwebûn

6-12 Nisan 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 16

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazışleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli

**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**


Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.


Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85


# Di demên êş û karesatê de


Înan Eroglu


**Demek e lê difikirim ka ev êşên wisa bûne mijara berhemên me yên kurdî. Min lêkolîn kir lê rastî tiştekî nehatim. Bêguman niha fam dikim ku ev tiştekî gelekî normal e. Ji bo miletekî bê par ji heq û hiqûqan, belkî nehewcehiyek bû nivîsandina van karesatên mezin ên xwezayî**

Sala 2011an, piştî Erdheja Mezin ya Wanê bi demeke kurt, mamosteyek ji Wanê hatibû li dersxaneya me dest bi kar kiribû. Li lîseyê bûm hingê û min xwe amadeyî îmtihana zanîngehê dikir. Ew mamoste diket kîjan dersa me nayê bîra min lê baş tê bîra min ku rojekê behs hatibû ser Erdheja Wanê. Li gor mamosteyî ew erdhej ne beleheq bû, xezeba Xwedê bû li ser wî bajarê ku rê û rêwanî ji fihûşê, alkolê, bêbaweriyê û hemû nelirêtiyan lê nemabû.

Pêşî lazim e bibêjim ev ne fikra wî tenê ye, fikra civatan giştî ye ku di hemû çax û zemanan de xwe daye der. Her wekî Erdheja Wanê, mirovan hemû karesat wekî cezakirin û tevgerên xwe yên nelirê hesibandine. MEZIN'ê baweriya wan, şiva xwe şanî wan daye.

Van rojan em di nav karesateke din re dibihurin, dinya ketiye derdê canê xwe. Ev êşa koronayê ne bi çarlepkan lê bi çargaviyan bi ser me de tê û wisa xuya dike ku qet nebe nîvê dinyayê dê bi vê êşê bikeve. Mela bang dikin ku her kes li mala xwe rûne û dia bike, xelk derdikevin şaneşînan û bi hev re dia dikin. Berî çend rojan dîmenek belav bû li ser medyaya sosyal, li Hindistanê tevî ku milet dizane wê lêdanê jî bixwe diçin mizgeftê û taeta xwe dikin. Maskeyek li ber devê polîsekî, şiva wî di dest de û kî ji mizgeftê derkeve dadiweşîne wan. Ew ji berê de amade ne ji dêvla ku şiva MEZINê wan li wan bikeve, şiva polîsê wan li wan bikeve. Diya min dia dike û dibêje helbet her tişt sebebekî xwe heye Xwedê tîne serê me. Diya min ne ji ber ku kurd e wisa difikire ne jî ji ber ku misilman e. Ew li kê dera dinyayê, ji kîjan qewmî, xwedî kîjan baweriyê û li çi çax û zemanî jî bûya dê sebebê wê li cem MEZIN'î bigeriya.

Nîvekê ewil ê sedsala 6'an webayeke mezin li dinyayê belav dibe ku bi navê Justinyenê Ewil ê împeretorê Konstantinopolê tê binavkirin. Hema tenê li Konstantinopola 500 hezar kesî, nîvê mirovan dimirin. Prokopiusê dîroknivîs ê şahidê wê Êşê dinivîse, "Mirovên şareza dikarin hin sebeban ji bo hemû belayên Xwedê şandî bînin. Lêbelê qet ne mimkin e meriv vê karesatê bi peyvan an jî bi fikirînê eşkere bike loma ti çareyek di destan de namîne ji bilî ku meriv hema wê bispêre Xwedê."

Sedsala 14'an webayeke din a mezin bi dinyayê dikeve. Ev weba wekî "Mirina Reş" dikeve qeydan. Weqanivîsekî ve serdemê vê Êşê wekî "Destê Xwedê yê ku dixwaze heyfa xwe hilîne" terîf dike. Ev Mirina Reş dibe sebebê nivîsîna berhemeke serekî ya dinyayê jî. Mirina Reş nîvê mirovên Floransaya bajarê xortaniyê yê Giovanni Boccaccio jî ditelifîne. Di Decameron a Boccaccio de heft jin û sê mêrên Floransayê ji bo ku ji vê karesata webayê xilas bibin biryar didin ku biçin şatoyeke li derveyî bajarî. 14 rojan li wir dimînin, bi maneya îro belkî gotina karantîna lê bê. Ji bilî rojên betlaneyê yên înî û şemiyê, ku deh roj ji wan re dimîne, her roj yek ji wan dibe qral yan jî qralîçe û deh çîrokan neqil dike. Boccaccio hîn di destpêka berhema xwe de diyar dike ku ew aqûbeta karesatê ji ber xirabiyên wan bû ku hêzên semawî yan jî hêrsa Xwedayî ew ji bo îslehkirina wan şandibû. Her wiha dibêje ji bo lutfa xwe ji Xwedê bixwazin, rojên dia û tobekirinê jî çêkirine. Ji ber van tiştan dê ne ecêb be ku Boccaccio di temamê berhema xwe de nîşan bide jîyana li nav dêrê çiqas xirab e û keşeyên wê jî çiqas şolên kirêt û nelirê dikin.




Webaya dawiya sedsala 16'an tesîreke xwe ya mezin li William Shakespeare heye. Şanogehên ew jî bo wan şanoname dinivîsîne ji ber vê êşê ji bo demekê têne girtin. Nikare şanonameyan binivîse. Huzneke mezin li ser wî heye, soneyên delal bi hewara wî de tên. "Weba" di berhemên wî de dibin biwêjek, nifirek, dibêje, "Bila weba cenewirê te bide ber xwe," yan jî "Webaya sor li bin guhê te keve." Şanonameya wî ya dawî, Bahoz, ne weba be jî behsa karesatekê dike -û ev karesat piştî gelek salan dibe îlham ji bo çîrokeke li ser webayê-. Antonioyê birayê Prosperoyê mîrê Mîlanoyê bi fen û fûtan birayê xwe û qîza wî li kelekekê dike û wan berdide behrê. Dest datîne ser mîrgeha birayê xwe. Haya Antonio jê tune lê ew behr li wan tê rehmê û xilas dibin. Prospero dibe xwedî cinekî jî ku sêhrên bêhawe dike. Di sêhrekê de keştiya Antonio û hevrêyên wî noqav dike lê wan nakuje. Hemû tên ber nigê Prospero. Prospero bi MEZIN'î wan dibexşîne. Gava ku Qeptan û Keştîvan tên cem wan, Gonzaloyê endamê mîrgehê herduyan şanî Prospero dide û dibêje:

*Binêre ezbenî, tu ji xwe re li vir binêre!*
*Çend kesên me yên din li vir in!*
*Tim dibêjim, heta ku sêdare li bejahiyê be*
*Nîne mirin ji bo vî mêrikî li nav behrê*
*Hey bêîmano; tew ji ber kufirbaziya te*
*Şefaeta Xwedê keştiya me terikand;*
*De tu mêr î li nav bejahiyê jî bide çêr û xeberan;*
*Çi bi te hat, gava derketî bejahiyê kuliyan zimanê te xwar?*
*Çawwa ye, tirro?*

Gulana 1842'yan çîrokek di Graham's Magazine de belav dibe. Ev çîroka bi navê "Maskeya Mirina Sor" a Edgar Allan Poe ya derheqê webaya "Mirina Sor" de li ser du jêderan bilind dibe: Decamerona Boccaccio û Bahoza Shakespare. Mîr Prosperoyê vê çîrokê êdî bi qasî yê Shakespeare ne qenc û bisiûd e. Li welatê wî ev êşa webayê belav bûye û qira xelkê wî tîne. Ji bo ku ji vê êşê xilas bibe tevî hezar peya û jinên tovrind yên welatê xwe vedikişin şatoyeke qewîn ku bi bedenên bilind dorpêçkirî ye û nahêle xelkê wî yê belengaz ji bedenan bibihure. Piştî pênc şeş mehan baloyeke bimaske li dar dixe û gazî her kesî dike. Heft salon bi jin û mêrên xwedî cilûbergên ecêb û bimaske tije dibin. Vedixwin, direqisin, şa dibin. Bi carekê re muzîk qut dibe, bêdengiyek çar hawîr digire. Beşdar çav bi kesekî ketine ku naşibe wan. Mêrik sax hestî ye û cilûbergên wî jî kefenê miriyekî ne. Maskeya wî xwîn e. Mîr Prospero dibêje, "ev kî ye?" û dide pey wî. Li heft salonan digere û hildide xencera xwe. Tam derba ku dê lêde ew xerîbê han lê vedigere. Xencera mîrê me ji dest dikeve û dimire. Beşdar wî xerîbî zeft dikin lê dibînin ku tu tiştek di bin maskeya wî de nîne. Di nav bêhêvîtiyeke mezin de ew hemû beşdar dikevin erdê û dimirin. Mirina sor çar hawîr dorpêç dike. Ev "destê Xwedê yê dixwaze heyfa xwe hilîne" ye, şiva MEZIN'î li serê dinyayê ketiye. Poe weku dixwaze bibêje, ev dinya ji mîr û hakiman re jî namîne.

Bi vê Êşa Koronayê re berhema edebî ya zêdetir ketî rojeva dinyayê jî Webaya (1947) Albert Camus e. Ev romana Camus ya meriv ecêbmayî dimîne ku em çiqas di du çaxên cuda de bin jî rewşa me ya li bin Êşê çiqasî dişibin hev. Roman behsa webaya 1944'an ya li Orana bajarê Cezayîrê dike ku bi peydabûna webayê re wî bajarî tenê dixin karantînayê. Dikandarekî ku bi vê rewşê re gelek tiştan stok dike ji bo ku paşê bi heqekî bihatir wan bifiroşe gava nexweş dikeve û tên wî dibin nexweşxaneyê, di bin nivîna wî de gelek qutiyên konserveyê tên dîtin, helbet dimire û "weba jî pereyê xwe nade"; kesekî ku hîn dibe bi webayê ketiye xwe çeng dike ser jinekê ji bo ew jî pê bikeve; kafeyeke ku ji bo mişteriyên xwe zêdetir bike li ser deriyê xwe dinivîse "şerab mîqroban dikuje." Ev çend detayên balkêş in ku di bîra min de mane.

Camus vê rewşa karantînayê wekî "sirgûnî"yê terîf dike û li gor wî tekane tiştê vî bajarî ji wan re aniye veqetîn û sirgûnî ye. Hîsa sirgûniyê ew valahî, heyecana berbiçav, daxwazeke ehmeqane ya vegera li rabirdûyê yan jî hewla bileztirkirina demê, rehên şewitî yên hişî ye ji bo wan ku di dilê wan de hesarge maye. Ev roman her wisa behsa van hemû tiştên li jorê jî dike. Keşeyê bajêr bê guman vê Êşa webayê pabendî Xwedê dike. Keşe Paneloux di weizên xwe de diyar dike ku ew di nav karesatekê de ne û ew vê heq dikin. Li gor wî di tarîxê de cara ewil Xwedê karesateke wisa aniye serê Firewn ji bo ku wî ceza bike û ew jî serê xwe li ber Xwedê bitewîne. Dibêje "Xwedê ev karesat nexwest" û dewam dike:

"Demeke dirêj e dinyayê bi xirabiyê re li hev kir, bawerî bi dilovaniya Xwedê anî. Tenê hinek poşmanî bes bû, destûr ji her tiştî re hebû. Jixwe kengî dema wê bihata mirov dê poşman bûbûna. Heta hingê ya herî hêsan meriv xwe nexista tengasiyê, jixwe miheqeq dilovaniya Xwedê dê her tiştî hel bikira. Lêbelê va ye, vê dê wisa dewam nekira. Ev demeke dirêj e Xwedê bi awirên xwe yên li ser bajêr dilê xwe bi xelkê dişewitîne lê êdî jê kerixî, bi wernegirtina bedêla hêviyên xwe yên bêhesab xeyalşikestî bû û awirên xwe berra aliyekî din dan. A va ye, em ê niha demeke dirêj dûr ji nûra Xwedê di vê dojehê de bijîn."

Demek e lê difikirim ka ev êşên wisa bûne mijara berhemên me yên kurdî. Ji nav yên min xwendî tiştek nehat bîra min. Dema nivîsandina vê nivîsarê bi heyecaneke mezin min li Kovara Jînê (1918-1919) ya pênc cildî ya bi amadekariya Mehmed Emin Bozarslan nihêrî û rûpelên wê li ser hev qulibandin bi fikra ku belkî agahiyekê li ser wê Êşa Mezin ya 1918'an bibînim. Rastî tiştekî nehatim. Bêguman niha fam dikim ku ev tiştekî gelekî normal e. Ji bo miletekî bê par ji heq û hiqûqan, belkî nehewcehiyek bû nivîsandina van karesatên mezin yên xwezayî.

Gava meriv van miriyên êş û karesatan dide ber miriyên şer û komkujiyan, yên Êş û karesatê zêdetir xuya dikin. Bes çi ecêb e şer û komkujî bêtir tesîr li me dikin, bêtir bîr û hafizeya me meşxûl dikin, bêtir xuya dikin di berhemên me de. Ev Êşa Koronayê dê çiqas tesîr li me bike, çiqas bîr û hafizeya me meşxûl bike, çiqas xuya bike di berhemên me de nizanim, lê heger wisa dewam bike qet ne îhtimaleke dûr e ku miriyên me bes bibin hejmarek ji nav milyonên mirî.

Bavê min ê ku pêşî bi cidiyet nêzî meseleya Êşa Koronayê nedibû niha li malê di karantînayê de ye ji ber ku temenê wî di ser 65'an re ye û gava mela her saetê carê bang û hişyariyan dikin ku xelk li malê rûnin û dia bikin aciz dibe û dibêje "bi qestî xelkê aciz dikin." Diya min dia dike û rewşa me dişibîne Êşa Mirîşkan. Şatoyeke min tune hildim wan bibim wir û heta ku ev Êş belav bû behsa çîrokan bikin ji hev re. Lê ne ku li "destê Xwedê" û "şiva MEZIN'î" jî nafikirim. Îhtimalek em ê ji vê Êşa Koronayê sax nefilitin lê hêvî ew e ev Êş zêdetir tesîr li me bikin, zêdetir bîr û hafizeya me meşxûl bikin, zêdetir xuya bikin di berhemên me de, rewşa me nebe wek a Êşa Mirîşkan û em nebin hejmarek ji gelek hejmaran heta ku hewcehî bi Xwedê û MEZIN'î nemîne.

